



# Sîstema cerdevaniyê dipelişe

● Bi hevdankuştina gelê Kurd ji mêj ve metodeke dewleta Rom e. Hîna di dema Evdîlhemîdê II. de dewleta Osmanî bi navê "Alayên Hemîdî" Kurdên nezan û cahil dixistin bin hîmayeya xwe û berê wan didan gelê Kurd. Bi wê metodê hem dijîti di nav gel de derdixist hem jî kontrolkirina serhildan û tevgerên azadiyê ji xwe re hêsan dikir.

● Îro jî dewleta Tirk bi eynî metodî dixwaze têkoşîna rizgariya neteweyî ya gelê Kurd bi hêz û alîkariya cerdevanan bisekinîne û biperçiqîne. Bes, Partiya Karkerên Kurdistanê bi metodên şoreşgerî hemû hêviya dewleta Tirk dişkîne û roj bi roj sîstema cerdevaniyê ji hev dixîne.

Rûpel 8



Cerdevan hêdî hêdî bi xwe dihisin ku ji aliyê dewletê ve hatine xapandin. Gelek ji wan niha divên dev ji çekên dewletê berdin û nema dixwazin li hember tevgera rizgariyê şer bikin.

## DI VÊ HEJMARÊ DE

### Huseyîn

Musa Anter

Rûpel 7

### Doh, îro û sibe...

Mizgîn Sîpan

Rûpel 14

### Ezmanê sahi baranê nabarîne

Memoyê Dekşûrî

Rûpel 12

### Ez Kurdistan im

Adar Jiyan

Rûpel 13

### Yekîtiya êzîdiyan hat damezirandin

Mamoste Emîn

Rûpel 8

### Li ser Asûriyan qirkirin qet nesekinîn

Seyîr Çiya

Rûpel 16

### Em çima ji rexnegirtinê ditirsin

Dilbixwîn

Rûpel 3

## WÊNESAZÊ 'DERBIRÎNA RENGAN': GOHDAR SELAHEDÎN


"Bi rastî wênevanên dinê gelek in û kevalên wan jî gelek min dîtine di kovar û berkên hatine çapkirin de, li derve. Bi rastî şolê wan gelekman maye sax, her çiqas ew bi xwe miribin jî. Ew hunermendên rastbêj di dilê gelan de dijîn û mane sax."

Rûpel 11

## KURDISTANA BAKUR NAVENDA XEBATA RIZGARÎXWAZIYA MILETÊ KURD E

Baweriya me wilo ye. Heta miletê me serxwebûna xwe nede qebûlîkirin pêşve naçe û tu caran heqê xwe nastîne. Baweriya me ew e ku, xebata serxwebûnê ji bo miletê me, xebateke siyasî, demokratîk, pluralîst û însanî ye.

Rûpel 6



# Rojnameya Welat û tîpa 'Q'

Belê ji hingî rojnameya Welat derketiye ez tim dixwînim, nivîsên Kurdî taqîb dikim. Nivîsên Kurdî ji Kurdan re feyde ye lê belê milêkî nivîskaran heya îro ku wek kêmasiyek e di çapemeniya Kurdî de.

Her kes wek xwe bi xwe dinivîsîne, rast an jî çewt. Ev tiştêkî ne dirust e. Divê mirov di zimanekî de zêde zane be, nexwe eger mirov xwe zane bihesibîne ev dê tim ji me Kurdan re pirsyar bin, wek xwendina Kurdî û nivîsa Kurdî.

Di vê nameya xwe de çawa hûn fêhm dikin, ez hinek gazinan ji we dikim.

Gilî û gazinên min ev in,

mînak; di nivîs û çapemeniya Kurdî de çewt herf tîn nivîsandin û tiştêkî gelek girîng ê din heye ku, hinek kelîmên Înternasyonal çewt tîn nivîsandin: Bi bîr û baweriya min ev tiştêkî şaş e.

Herf û kelîmên çewt ev in.

Mînak: Qaset, Kaset, Cassete, Kassete.

Qart, Kart, Kort, Card Çekel, Çakal, Chakal, Schakal

Qomando, Komando, Comand

Qominizm, Komînizm, Cominîzm

Qamera, Kamera, Kamera

Qamp, Kamp, Camp

Qontax, Kontakt, Contact

Qompanî, Kompanî, Companî

Qomîniqasyon, Kominkation, Kominikasyon, Communication

Qapîtal, Kapîtal, Capîtal

Parq, Park

Teqşî, Taxi

Ew kelîmên han ne bi Kurdî, ne jî bi Tirkî ne û bi vî herfî tîn nivîsandin. Erê belkî telafûza gelê me îro wisa derdixwe ev jî kêmasiya xwendevantiya Kurdî ye.

Min mînak ji zimanên Ewrûpiyan dabû, lê niha min divê hinek li gor me bi xwe bidim. Mînak gelek kelîme hene ku eslê xwe bi

G'yê X'yê, K'yê, C'yê, R'yê ne, em rast tîn carinan ku exlebî jî wan bi Q'yê hatiye nivîsandin.

Herf û kelîmên li binyata xwe û yên li derê binyata xwe.

Qeşem, Cemed

Qîm, Riz (a) xwe

Qîrase, Girase, Grasê

Baq, Bax

Boq, Box

Qûl, Kuld

Li Ewrûpayê gelek nivîskar û mamosteyên me yên Kurd hene gerek ew van herf û kelîman ji hev veqetînin. Gelek silavên dilovanî li we be dost û ho-

giran.

**Bayram**

## FERHENGOK

Avakar: Baş, maqûl

(yapıcı, olumlu)

Bi dūmahikanîn: Qedandin,

temamkirin (bitirmek)

Bi hevketin: Li hev xistin,

şerkirin (çatışmak)

Dager: Rêvebir ( yönetici)

Dagerîn: Rêvekirin

( yönetmek)

Evar: Pezkûvî (yaban keçisi)

Gerdûn: Dinya (dünya)

Kat: Dem, saet, wext

Keval: Grafik

Kevalker: Grafiker

Kudandin: Di rê de çuyin

(yol katetmek)

Licimîn: Kulîn (hafifçe

sekmek)

Leqitîn: Terpilîn (takılıp

düşmek)

Maldar: Xwedîmal,

dewlemend (varlıklı, zengin)

Nimandin: Kifşkirin, diyarkirin

(belirtmek)

Nimandî: Kifşkirî, diyarkirî

(belirtilen)

Pişikdar: Hevpar, şîrîk (ortak)

Pişikdarî: Hevparî şîrîkî

(ortaklık)

Pola: (Çelik)

Qeliqîn: Qilqilîn, yerinde

duramamak)

Resen: Nijad, irq (soy, ırk)

Rûdan: Bûyer (olay,

fenomen)

Sûd: Feyde, kar (yarar)

Şêlî: Şîlo, şolî

Şkeva: Bêhavên (mayasız)

Nanê şkeva: Nanê bêhavên,

nanê bêhevîrtîrş (mayasız

ekmek)

Terrî: Dûv; boç, qemçik

(kuyruk)

Tûtîk: Mirîşk (tavuk)

Xêzîn: Xêzkirin, kifşkirin

(çizmek, belirlemek)

Xwezûr: Bavê jin an jî mêrekî

(kayınbaba)

Xweşî: Xesû (kaynana)

Xwîngerm: (Samimi,

sıcakkanlı)

Ziha: Ziya, marê herî mezin

(büyük yılan, canavar)

## 'Ey Reqîp' binivîsin

Hê ku min dest bi nivîsandina xwe nekirî ez silavê xwe li ser navê rojnameya Welat, ji rojnamevanên wê û nivîskarên wê re, rê dikim.

Ez her heftî Welat dikirim û dixwînim, piştî min ew xwend, min ew rojname da destê hevalên xwe ew jî nû dixwînin lê gelek herfan jê fêhm nakin. Ez ji wan re tiştê zanim dibêjim, ji bo ku hîn bibin. Bi xwendina Welat zehf (pirr) kêfxweş dibin.

Rica min ji xwendevanên Welat ev e ku bi hemû hevalê xwe, mirovê xwe, yên dora xwe Welat bidin xwendin.

Rica min ji rojnamevanên Welat ev e ku di rûpelekê de merşa me ya "Ey Reqîb" binivîsin. Ezê zehf kêfxweş bibim.

### ZIKÊ ERDÊ TIJÎ BÛ

Şev û roj xwîn rija Zar û ciwan gel tev dimirin Tev şehîd dibin bes e gel bes e

Zikê erdê tijî bû.

Şev radizin roj ranabin Li binê zindana ne Bes e gelê me êdî bes e Zikê erdê tijî bû.

Zaro navê xwe nastînin Bav û dê ji wan distînin Bi nivîsekî, bi xeberdanekî Zikê erdê tijî bû.

Azad nabin, nabin serfiraz Ma heta kengê emê bindest bin

Bes e gel êdî bes e looo...

Zikê erdê tijî bû.

**Heval Îzzet Lawîkê Eynê / Sêrt**

## Ez bi şabûn Welat dixwînim

Xebatkarên rojnameya Welat silav. Saxî û selametiya we armanca dilê me ye.

Ez bi şabûneke mezin vê rojnameyê dixwînim. Ew bi heweskarî tê weşandinê.

Heta niha çend kitêbên min bi Kurdî hatine weşandin. Ji sala 1991'ê ve Navgîna Çanda Kurd heye. Ez sedrê (serokê) wê bûm redaktorê rojnameya Dengê Kurd bûm. Niha li Bakuyê ji bo zimanê Kurdî heftiyê du caran xebardane bernamêyê tê dayîn. Ez-niha redaktorê vê berna-

meyê me. Ev e ji du salan bêhtir e ku, ez li ser romanekê dixebitim. Navê vê romana min 'Birîn' e. Di sala 1937'an de ji Ermenîstanê hinek jî, ji Nexçivanê; paşê di sala 1944'an de ji Gurcîstanê Kurd hatibûn nefîkirin (surginkirin). Min roman li ser van salan nivîsiye. Ez keriyekê (parçeyekê) vê romanê ji we re dişînim. Heke li xweşa we bê, hûn wê biweşînin ezê pirr şa bibim.

**Ahmedê Hopo / Baku**

## Bi hesreta rojên azad

Bi hesreta rojên azadî û rizgariyê gelek silavên min ên dilî û şoreşgerî ji nivîskar û xwendevanên Welat re hene.

Ez xwendevanekî Welat im, li bajarê Îzmîr'ê li karistanekê dixebitim. Daxwaziyeke min ji hinek karkerên Kurd heye. Ez carina hinekan dibînim ku rojnameyên Tirkî dixwînin. Gelo bo çî Özgür Gündem û Welat naxwînin, diçin rojnameyên Tirkî dixwînin. Ma qey hûn hê nizanin li Tirkîyê terora mezin a rojnameyên Tirkî in. Heger hûn heza-

rek xwe jî bidin rojnameyê Tirkî, baş bizanin zerara we tê de heye. Çima hûn Gündem naxwînin. Gündem nûçeyên rast tîne ber çavan.

Daxwaza min ji we ku hûn Welat û Gündemê bixwînin. Ew dengê me ne û ew rojnameyên me ne. Welat hê bi pênc hezar e. Gelo ew pere ye. Na! Qet tu tiştî nîn e. Daxwaza min ew e, Welat bixwînin û binasînin.

Bimînin bixêr.

**Dawut Dilbirîn Bornova / Îzmîr**

## Merheba

Gelek silavên şoreşgerî li we dikim, gelî xebatkar û xwendevanên Welat.

Her roja yekşemê dema ez diherim cem bayiyên rojnameyê ku Welat bikirim, gelek kêfxweş dibim. Min divê ez ji we re spasîyên xwe bi nameyekê bişînim.

Mamosteyên hêja!

Dema ku ez Welat dixwînim, min divê ku Welatên tîn Antalya hemû bikirim û li gel belav bikim. Ji bo mêze bikin ku rewşa Welat û Kurdistanê çiqas xweş e. Xebatkarên Welat çî alîkariya ku ji me bê em dê bi we re bikin.

Min divê her tim Welat hebe. Disa gelek silavên şoreşgerî li xebatkar û xwendevanên Welat dikim. Bimînin di xweşiyê de.

**Salîh Demîr / Antalya**

## Şervanê leheng Ziyad Mihemed (Gabar)

Şervanê leheng, kelemê çavê dijmin  
Heval Ziyad Mihemed (Gabar) te;  
Di êrîşê de weke baz  
Di lêdanê de mîna şer  
Di lehengtiyê de weke piling  
Girt ser tabûra kedxwaran li Rubarokê...  
Û tu, bi bîr û bawerî bilind bûyî  
Ji çiyayê Gabarê bilindtir!  
Em soz didin te û hevalên te  
Akîf, R. Xelîl, Nîştîman, Felat  
Rojhilat ku, emê bîranîna we di Kurdistanê  
Serbixwe di jîn bikin...

**Mihemed Mihemed**

## Nûçeyên Cengê

# Germa şer dagirkeran dişewitîne

● *Ev hefteya dawî êrişên gerîla pêl dan, livbaziyan mezin çebûn, gerîla avêtin ser gelek qereqolan, bi dehan leşker, cerdevan û tim kuştin gelek ji wan jî birîndar kirin. Dewletê jî piştî van bûyeran berê xwe dan gel, malên wan talan kirin gelek mirov xistin binçav, mirov bi destê kontrgerîla dan kuştin. Dewlet di pêkanîna karên kirêt û hov de tu sinoran nas nake, di şerê li çiyayê Nurhak'ê de çekên kîmyewî û biyolojîk bikaranîn.*

**30 Tirmeh 1993:** Hêzên dewletê bi roketavêjan girtin ser gundê Girêsor ku li ser navçeya Dêrikê ya Mêrdînê ye. Di vê bûyerê de gundiyek bi navê A. Selam Toprak hate kuştin. Gundê Xozeberî, ji alî hêzên tarî ve hat gulebarankirin û 10 mal hatin rûxandin.

Li gor agahiyên KURD-HA, li çiyayê Gabar û Herêkolê, di şerê navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewlete de, heta niha 26 leşker, 2 serbaz, 3 cahş, hatine kuştin û 2 gerîla jî bi navê xwe Ramazan û İsmail hatine qetilkirin. Li gundê Sîrfê, Hevîluk û Warkasim ku li ser navçeya Şirwanê ya Sêrtê ye, di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket, di şer de 2 gerîla hatin kuştin, 3 gerîla jî birîndar bûn. Li gundê Çanakçî ku li ser navçeya Darahênê (Genç) ya Çepekcûrê (Bingöl) ye, gerîla û hêzên dewletê li hev xistin, di vê bûyerê de 4 gerîla, 2 cerdevan û lêzimekî cerdevanan hatin kuştin, 7 cerdevan jî birîndar bûn.

Gerîlayên ARGK'ê li ser rîya di navbera İmranlı û Zara'de ku navçeyên Sêwazê ne, nasname kontrol kirin. Di kontrola nasnameyan de gerîla serbazek kuştin û tûristek jî bi xwe re birin. Li gundê Karabeyî ku li ser navçeya Geverê (Yüksekova) ya Cûlemêrgê (Hekari) ye, gerîla 3 malên cerdevanan şewitandin û 5 cerdevan bi xwe re birin. Li gundê Kuruçova ku li ser navçeya Doğanşehirê ya Meletê ye, di navbera Gerîla û hêzên dewletê de şer derket. Di şer de 6 leşker hatin kuştin. Piştî vê bûyerê li Meletê gelek kes hatin binçavkirin. Ên ku navê wan hatiye tesbîtîkirin ev in: Şah Huseyin Pekdemir, Kemal Kalik û Deniz İnan.

**31 Tirmeh 1993:** Piştî êrişê gerîla ya ser avahiya Emniyeta Hezoyê, hêzên dewletê êrişî dikanên esnafan kirin. Êrişê gerîla 45 deqîqe dom kir, avahiyên fermî xesarek mezin dîtî. Li dû vekîşîna gerîla, hêzên dewletê dest bi talankirina dikanên esnafan kirin û avêtin ser malan û zêdetirî 100 mirovî girtin binçav. Gerîla li Farqînê li gundê Boşatê 6 lêzime cerdevanan revandin. Demê berê gerîla cerdevanê gundê Boşatê ji bo çekberdanê

ikaz kiribûn.

Li Sîlopi gerîla livbaziyek li dijî qereqola Görümlü pêk anîn. Di vê bûyerê de 2 panzer îmha bûn. Di şerê navbera leşker û gerîlayan de gundiyek mir, jinek jî bi xedarî birîndar bû. Piştî vê bûyerê, leşkeran şerê bir ser gundê Bêşêrê û Şirvanîyan ji gund valakir. Li Kuşadasi piştî teqina bombeyekê, tevî 5 tûristan 16 kes birîndar bûn, piştî bûyerê 11 kes hatin binçavkirin.

**1 Tebax 1993:** Gerîlayên ARGK'ê avêtin ser qereqola gundê Tîmoqê ku, li ser Hezoya navçeya Batmanê ye. Piştî, vê êrişê ku, bi roketavêj û çekên giran pêk hat, 60 leşker mirin, li herêma Mongita û Mişrîta erebeyên leşkerî li mayinên gerîla qelibûn, 7 leşker mirin, 5 erebe jî îmha bûn. Di eynî rojê de gerîla avêt ser tabûra Sasonê, li wir ji gelek mirin û birîndariyên hêzên dewletê çebûn.

Li gundê Alacakaya ku, li ser Mazra ye gerîla gulle reşandin ser servîsa tesîsên Ferrokrom, di vê êrişê de 3 kes mirin. Gerîla li Çêlê (Çukurca) ya navçeya Cûlemêrgê jî avêtin ser qereqolekê, di vê bûyerê de 9 leşker mirin. Gerîla li Çepekcûrê avêtin ser gundekî bi navê Yekman, hevkarên dewletê kuştin û muxtarê gund jî bi xwe re birin.

Piştî şere ku, 3 roj berê, di nav hêzên dewletê û gerîlayên ARGK'ê de li çiyayê Nurhak derketibû 19 gerîla, 9 leşker û 10 timên taybetî mirin. Navên gerîlayên ku, di şerê li çiyayê Nurhakê hatin kuştin ev in: Qomutanê Eyaleta Başûrê Rojhilat Sabrî (Şixo Dîrlîk), Kasim, Zinar, Nurhat, Mahmut, Kurdo, Piling, Bawer (ji başûrê Kurdistanê) Hasan (Konya Cihanbeyli), xebat, Mêrdîn Deniz (Elbistan), Berivan (Pirîn), Welat (Elbistan) Egîr (Elbistan), Nasir (Elbistan) Ferhad (Amed). Li gor agahdariyên ku, lêzime gerîla dan dewletê çekên biyolojîk û kîmyewî bikaranîne. Lewre lêzime hinek gerîlayan ew nasnekirin û destvala vegeyiran. Gerîla avêtin ser Mûşê û di navbera hêzên dewletê û gerîla de şer derket, gerîla dîrekên elektrîkê û dozerek tahrîp kirin û vekîşin. Li navçeya Bilîsê Motkî di navbera leşker û gerîla de

şer derket, ev şer 2 rojan dom kir, di şer de 20 leşker mirin, 30 leşker jî birîndar bûn.

**2 Tebax 1993:** Li herêma Çaygeçit ku li ser navçeya Motkî ya Bilîsê ye hêzên dewletê û gerîlayên ARGK'ê li hev xistin, di vî şerî de 32 leşker hatin kuştin. Dozgerêk (sawci) bi navê xwe Mehmet Ergül û Doktor Alî Sarpkaya tevî 3 cerdevan bi xwe re birin. Gerîlayên ARGK'ê avêtin ser gundê Aşaxîcivanlı ku li ser navçeya Tuzluca ya İdirê ye, muxtarê gund Mikail Sevîndik û 3 cerdevan kuştin, 4 kes jî birîndar kirin. Ji herêma Serhedê 250 kes ketin nava refên ARGK'ê, di nava wan de xwarziye Serokê Belediya Cûlemêrgê Şükür Çalin û lawê Serokê Belediya Navşan (Şemdinli) ê Selahattin Çiftçi jî hene.

**3 Tebax 1993:** Gerîlayên ARGK'ê avêtin ser Pulumura navçeya Dêrsimê, avahiyên dewletê bi çekên giran kutan. Piştî vê bûyerê avahiya Qomutaniya Cendirmeyan a Navendî, Midûriya Çandiniyê (Tarim) û Ofîsa Petrolê, 2 tankêr şewitî, 2 kes jî mirin. Gerîla avêt ser gundê Ferxînis ku girêdayî Saxê (Çatak) ye, leşker hatin alikariya cerdevanan, du kes mirin û cerdevanek bi navê xwe Cebraîl Esîne birîndar bû. Li Navşan (Şemdinli) jî gerîla avêt ser qereqolê, li gor AA. 2 leşker mirin agahdariyên berfêrê hîn negihîştine destê me. Li navçeya Pirînê, li Çêlik di navbera hêzên dewletê û gerîla de şer derket, li gor agahdariyên herêmî gelek leşker û tim mirin.

**4 Tebax 1993:** Gerîla avêt ser qereqola Geverê serbazek, çavîşek, 6 leşker û 2 cerdevan kuştin. 2 leşker û 2 cerdevan jî birîndar kirin. Li aliyê din êrişên dewletê û kontr-gerîla li dijî gel didome. Li Dîlokê di nava heftiyekê de 2 kesên Cîzirî bi destê kontr-gerîla hatin kuştin 1 jî birîndar bû.

**5 Tebax 1993:** Li Çepekcûrê, li gundê Solhan Arslanbeylî 11 kes jî aliyê kesên nediyar ve hatin kuştin. Li nêzî gundê Elika ya li ser Farqînê gerîla êrişî qereqolê kirin. Leşkerêk mir, gelek leşker jî birîndar bûn. Gerîla li ser rîya ziyaret û Çaykanê serbazê qereqola Kermatê birîndar kirin.

# HAWAR

Dilbixwîn

## Em çima ji rexnegirtinê ditirsin?

Jiyan bêtî guhertin nabe, divê nakokiyên dijwar di navbera kevin û nû de hebin. Girîng e were zanîn jî ku, nû li ser bingeha rexnekirina kevin ava dibe. Her nûyek hilweşandina kevinekê bi xwe re tîne. Ji lew re nûbûn dibe sedema pêşveçûnê, felsefeya jiyane wisa ye; eger bixwazî ber bi pêş ve gavan biavêjî divê tu xwe nû bikî. Nûkirin jî rexnegirtina li kevin dixwaze, heya tu kevin rexne nekî tu nikarî nû bibî, di vir de pêwîst e em di rexnegirtinê de bi cesaret bin û jê netirsîn.

Gelek caran ev çek (sîleh) negatîv jî tê bi kar anîn, di encamê de rewşê kambax dike. Rê li pêşiya nûkirinê digire û dibê kelem. Bêguman divê em xwe ji van cure rexneyan biparêzin. Lê ev nayê wê wateyê (maneyê) ku em ji her stranê re serê xwe bihejînin û bibêjin: "Tewlo", helwestên liberal û xweparastina ji rexneyên avakar tu sûd û feydeyan nagihînin pêşketina me.

Maksîm Gorkî li ser rola rexnegirtinê di nivîseke xwe de wiha dibêje: "Rexne mîzîn e. Mîzîna jiyane ye, bi wê mîzîne pîvandinê çêdibe, bi wê pîvandinê re bi-jartinê dirust dibe, wê hengê em dikarin tiştan ji hev cuda bikin. Her wiha ji bo berhemên wêjeyî jî ev mîzîn lazim e, divê bi wê mîzîne em, berhemên ku derdikevin bipîvin."

**Rast e, rewşa me ya siyasî em wisa bêdeng hiştine ku çavên xwe ji her tiştî re bigirin û li kêmasiyan rexneyan negirin. Eger em pêşketinê dixwazin, werin em li berhemên hev rexneyan bigirin. Kêmasiyan bi cesaret binin ziman, veşartina kêmasiyan eniyan çandê li hemberî dijmin mezin nake. Werin em li berhemên hev rexneyan bigirin.**

yên helbestan bêhtir in. Dema ku mirov li pirtûkxaneyê Erebi dinêre ev rastî heya dawiyê zelal dibe. Bi rexnekirinê pêşxistin afirandine, weke me ji her tiştî re negotîne: "Baş e." Heya ku başbûn were dîtin, gerek e em bi mîzîna rexneyan bipîvin.

Carekê min di vê koşeyê de nivîsek li ser hinek nivîskarên Kurd ên li Swêdê dimînin nivîsandibû. Ji hinek aliyên ve min ew rexne kiribûn, di nêrîna min de ew rexne di cih de bûn. Ji ber ku koşe teng bû, min bi firehî nêrîna xwe şîrove nekir. Armanç ji wê nivîsê ne teşhîrkirina kesên bû ku ji bo min ne tiştêkî enteresan e jî, armanç zelalkirina kêmasî û şaşiyên çêdibin bû.

Mamoste Amed Tîgrîs jî di "Pênûs" a xwe de rexne li nivîsa min girtibû û nêrîna xwe anîbû ziman. Ez gelekî bi wê nivîsa wî kêfxweş bûm.

Hinekan ev diyaloga di navbera me de şaş nixandî, gotin: "Aman! Têkevin nava wan wê hev bikujin..."

Hinekan jî gotin: "Em rûpelê rojname û kovaran dikin warê şer û cengê..." Di Welat, hejmar 74 de birader Fener Rojbiyanî, nivîsa min û mamoste Tîgrîs weke şer û cengekê dibîne. Li vir hevîdar im birêz Fener bêhna xwe fireh bike û haydar be ku di vê cengê de kesek nehate kuştin. Kesek bi operasyonan ranebû.

Ji bo kesên meraq dikin jî dibêjim; tu problem di navbera min û mamoste Tîgrîs de derneketin, em ji hev nêzîktir bûn, hevalên hev rexne nekin ew pêşketina hev naxwazin û alikariya hevalê xwe nakin.

Fener Rojbiyanî, hem li me hem jî li rojnameya Welat rexneyan digire, ku me dijmin berda ye û em li hemberî hev rabûne. Lê mixabin ji bîr kiriye ku, heya tu eniya çandê xurt bikî, divê tu nehêlî tu ziyana bigihîje wê.

Rast e, rewşa me ya siyasî em wisa bêdeng hiştine ku çavên xwe ji her tiştî re bigirin û li kêmasiyan rexneyan negirin.

Eger em pêşketinê dixwazin, werin em li berhemên hev rexneyan bigirin. Kêmasiyan bi cesaret binin ziman, veşartina kêmasiyan, eniya çandê li hemberî dijmin mezin nake.

Werin em li berhemên hev rexneyan bigirin.

## Îlana şerê antî-faşîstan

Dijwarbûna tewra Almanayê ya li hember biyaniyan û êrîşên faşîstên serût ên ku dibin sebeba kuştin û şewitandina kesên biyanî yên li Ewrûpa dijîn, li aliyê din bû sebep ku, kesên li dijî nijadperestiyê ne dengê xwe bilind bikin. Bi taybetî jî bûyera Solîngenê ku pênc jin û zarokên Tirk hatibûn şewitandin û vir ve, antî-faşîstên li Almanya dengê xwe hîn bilindtir kirin û yekîtiyê xurt di nav xwe de damezirandin.

Çepgirên Almanayê yên radikala dibêjin ku dema bersivdana terora faşîstan hatiye û nema dikarin dengê xwe ji êrîşên wan ên li hember biyaniyan re dernexin. Ji ber vê yekê jî, li dijî faşîstan şer îlan dikin. Ji rêxistina ciwanên li dijî nijadperestiyê li Ewrûpayê (JNE) xortekî 22 salî Sasiha Staniziz, li gor agahiya Ajansa Reuters'ê hêrsa xwe wiha îfade dike: "Em cengê îlan dikin, ev a ku ji Almanayê re lazim e."

Antî-faşîstên Ewrûpayê, bi taybetî jî yên li Almanayê bi sloganên wek "Berxwedan", "Eftû nekin", "Nazîzmê bisekinînin" tewra xwe nîşan didin. Weke tê zanîn ev kesên li dijî faşîzmê wek "Antîfa" tîn binavkirin. Tenê li herêma Cologne û Bonn'ê nêzîkî 60 grûbên antî-faşîst hene. Niha her navçeyêke Cologne grûbên xwe yên "Antîfa" yê hene. Li aliyê din, hate hînbûn ku hin kesên faşîst li dijî rêxistina "Antîfa" yê rêxistineke bi navê "Antî-Antîfa" damezirandin. Antî-faşîstên girêdayî rêxistina "Antîfa" yê jî bûyeren dawî û vir ve êdî her cure çalakî û faliyetên li dijî faşîstan pêwîst û li cih dibînin. Yek ji berpirsiyarê ve rêxistinê ditina xwe wiha pêşkêş dike: "Em rê nadin ku gelê masûm bê qetilkirin. Ji bo vê jî bi çî awayî û metodê dibe bila bibe, emê li dijî faşîzm û nijadperestiyê ser û têkoşîn bikin."

## Qralê Belçîkayê Baudoin mir

Qralê Belçîkayê Baudoin'ê Yekemîn ku ji 42 salan û vir ve li ser kar bû roja 1'ê Tirmehê li bajarekî Îspanya Motrîlê mir. Baudoin û jina xwe ya bi eslê xwe Îspanyol her sal van çaxan ji bo geştê diçûn havîngeha xwe ya Motrîlê, Qralê Belçîkayê Baudoin ji qelbê xwe nexweş bû û sala çuyî emeliyateke qelb derbas kiribû, lê tevî ve aemeliyatê qelbê wî di dema ku wî gešta xwe li havîngeha Motrîlê dibuhurand de sekinî û pê mir.

Li ser mirina Baudoin, parlamentoya Belçîkayê amadekariya tayînkirina qralekî dike ji bo ku şûna qralê berê vala nemîne. Li gor qaydeyên qraliyeta Belçîkayê birayê Baudoin, Albert de Liege wê şûna birayê xwe bigire. Li gor agahiyên televizyona Belçîkayê roja 10'ê Tebaxê wê Albert bibe qralê nû.

# Zûlûyan bi êrîşekê 30 reşîk kuştin

● *Li Afrîkaya Başûr neheqî û pesta li ser reşîkan xelas nabe. Dewleta Afrîkaya Başûr ya nijadperest ji bo rawestandina tevgera azadiya reşîkan nema dikare metodên berê bi kar bîne. Ji ber vê yekê dest bi metodên din dike. Van hefteyên dawî dijberiyê dixwe nav qebileyên Afrîkî û terefdarên Kongreya Nete-weyî ya Afrîka. Bi êrîşên qebileyê Zûlûyan hefteya çuyî 30 reşîk hatin kuştin. Dewleta Afrîkaya Başûr rêlibergirtina van bûyeran li aliyekî, dixwaze wan hîn geş û gurtir bike.*

**Nûçeyên Derve-** Roja 1'ê Tebaxa 1993'yan li Afrîkaya Başûr li navçeya Tembisyê, ku 20 km ji Johannesburgê dûr e 200 mirovên bi çek ji qebileyê Zûlû êrîş birin ser avahiyan ji niştevanên navçeyê ku, gelekên wan dilxwazê KNA'yê (Kongreya Nete-weyî ya Afrîkayê) ne û 33 kes kuştin, gelek mirov jî birîndar bûn.

Piştî vê qirkirina hov gelek rûniştvanên navçeyê roja yeksemê avahiyan xwe berdan, reviyân. Li dû xwe deriyê bi berrikan qulbûyî,

pacên şikestî hiştin çûn.

Cihê ev qirkirinê lê çêbû, tenê 5 km ji cihê ku, zêdetir 20 partî û rêxistinên spî û reşîk, ji bo lihevkerîne û danîna bingeha hilbijartinên serbest li hev dicivin dî re. Serokkomarê Afrîkaya Başûr F.W de Klerk dixwaze, li ser pirsgerêka nijadperestiyê di nav partiyên dij-raber û hikûmetê de hinek li hev hatinan çêbike û di meha Nîsanê de hilbijartinê li dar bixe. Lê ev bûyer dê li gelek deverên wek Tîmbesayê ku piştigirê KNA'yê ne



Li Afrîkaya Başûr vêga jî êrîşên qebileyê Zûlûyan rê li tevgera reşîkan digire.

rê li ber hilbijartinê bigire.

Li gor vegotina mudirê polîsan Wickus Weber, şeva şemiyê Zûlûyên ku, li xana karkerên koçber diman, derketine kolanan berrik reşandine ser avahiyan û agir bi erebeyan xistine.

Tê gotin ku, niştecihên xanê

piştigirê PAI'yê (Partiya Azadiya Inkatayê) ne û niştecihên navçeyê ji dilxwazê KNA'yê bûne. Ji sala 1980'an heta sala 1990'an di şerê navbera KNA'yê û PAI'yê de zêdetirî 10.000 mirov mirine. Lê heta niha bûyerê wiha berfireh û hov neqewimibû.

## Êrîşên nû li dijî bajarên Tirk ên tûrîstîk

**Ji çapemeniya biyanî, Libération-** Li Kuşadasi'yê hijdeh kes, du heb jê Holandî, bi teqîna bombeyekê birîndar bûn.

Êrîşên siyasî yên tevgerên Kurd ên li dijî tûrîzma Tirk didomin. Hîna şeş tûrîstên biyanî yên ku ji Wanê hatibûn revandin, di destê zîlamên Partiya Karkerên Kurdistanê de ne, li bajarê tûrîstîk ê Tirkîyê, Kuşadasi'yê ku li keviya Behra Ege ye û nêzîkî kevnebarjê Efesê ye, bi teqîna bombeyekê 2 kes jê Holandî hijdeh mirov birîndar bûn.

Heftayekê berî qewimîna ve bûyerê, eynî bi wî awayî bombeyek li Stenbolê li ber mizgefta Sultan Ahmet teqiyabû çar kes birîndar bûn.

Çend roj berî hengê li hewşa hotêleke li Antalyayê, ku bajarê herî tûrîstîk ê Tirkîyê ye, di-sa bi teqîna bombeyekê kesek hatibû kuştin.

Di 27'ê Hezîranê de êrîşên nola yên li jor li eynî bajarî hatibûn pêkanîn û deh heb jê tûrîstên biyanî 22 kes birîndar bûbûn. Her çiqas kesî berpirsiyariya van bûyeran ne girte ser xwe jî, rayedarên Tirk serhildêrên (asiyên) Kurd sîcdar dike.

Bi xurtbûn û zêdebûna hêza gerîla ve li Başûrê Rojhilata û Rojhilata Tirkîyê, hêzên PKK'ê pîrr biryardar xuya dikin ku tûrîzma Tirkîyê ya di nav pêşveçûneke mezin de ye, vemirînin.

Di nameyêke ku PKK'ê ji bal-yozxaneyê Swêdê ya li Atîna re şand de îqaz kir ku keviya behrê ya rojavayê Tirkîyê wek herêma cengê dihesibîne.

Cemîl Bayik ku di nav PKK'ê de zîlamê duyemîn e û şefê şaxê leşkerî ye, di hevpeyvîna bi rojnâmeya Turkish Daily News'ê de te-yîft kir ku, tûrîstên di destên wan de wê bîr berdan û cih da van gotinan: "Tîştê me yê li dijî tûrîst-tan tune lê tûrîzma bi awayekî objektîf dike desteka siyaseta cengê ji bo Tirkîyê, ji ber vê yekê em ji tûrîstan dixwazin ku newin Tirkîyê."

Dagerên PKK'ê yên ku ji bo bala raya giştî ya Rojava bikişînin

ser têkoşîna serxwebûna Kûrdîstana Tirkîyê, van livbaziyan revandinê pêk tînin, li aliyê din baş dizanin ku pêwîst e di vê helwesta xwe de bi dîqet bin û nava xwe û Ewrûpayê xera nekin. Ji bo vê jî, berpirsiyariya bûyerên li deverên tûrîstîk diqewimin nagirin ser xwe.

Mirina tûrîstekî -nexasim mirina rehîneyek ji yên ku revandina wan girtiye ser xwe- wê berê polisên Fransewî, Belçîkayî û Almanî bide ser xebat û faaliyetên PKK'ê yên li Ewrûpa. Li Brukselê Rêxistina Civaka Ewrûpayê û dewletên endamên ve rêxistinê roja 31'ê Tirmehê daxwaz kirin ku, hemwelatîyên wan bi lezgi nî bêsêrt û şî-rût bêne azadkirin.

## Li Lubnana Başûr bêhnvedana şer

**Nûçeyên Derve-** Şerê di navbera Rêxistina Hizbullah û Îsraîl de roja şemiyê sekinî. Îsraîl, Lubnan û Sûrî, bi rawberiya Amerîkayê di mijara notralîzekerîna rêxistina Hizbullah de li hev hatin.



Artêşa Îsraîl ya dagirker bi bombebarankirina pêvajoya heft rojan 70 gund hilweşandin û kirin kavi.

Hikûmeta Şamê di vê lihevhatinê de bi pesta Amerîka tawîzên girîng dan Îsraîl.

Piştî ku hêzên Îsraîl pêvajoya heftayekê Lubnana Başûr bombebaran kir, bi navberiya Amerî-

ka, dewletên Îsraîl, Lubnan û Sûrî li hev hatin û roja şemiyê piştî nîvro li herêma Lubnana Başûr gurme gurma bombe û topan cihê xwe da bédengiyekê.

Di êrîşên ku artêşa Îsraîl biribûn ser Lubnana Başûr, de zehfên wan sivil 130 kes miribûn, zêdeyî 500 kes birîndar bûbûn û nîv milyon mirov jî ketibûn ser rîyan û koçber bûbûn, 70 gund jî hatibûn wêrankirin.

Piştî danezanîna şerrawestîne, kesên ku ji ber êrîşên Îsraîl ber bi Bêrdê ve reviyabûn, careke din dadigerin Lubnana Başûr.

Di pêvajoya şerê heftayekê dom kir de li Galîleya-Jor du leşkerên Îsraîl jî bi roketên Katiçû yên Hizbullah hatin kuştin 34 leşker jî birîndar bûn. Li vê navçeyê Îsraîl jî aliyê aborî ve derbeyên mezin xwarin ji destê Hizbullah.

Piştî biryara şerrawestîne, Serokwezîrê Îsraîl Îzak Rabîn wiha

axivî: "Ger peymanê şerrawestîne bê pêkanîn ev tê wê wateyê ku operasyona me ya Edeletê gi-hîştîye hedefa xwe."

Îzak Rabîn gotinên xwe wiha domand: "Ez ne li serfiraziyê lê ji bo probleman li çareyekê digerrim."

Berpirsiyarê rêxistina Hizbullah jî der barê şerrawestîne de gote ku ta ku Îsraîl êrîşî ser wan û gelê Lubnan û Filîstînî neke ew jî roketên Katyuşa bi kar naynin. Bes şerê me wê li dijî hêzên Îsraîl yên ku Lubnana Başûr îşgalkirinê wê bidome.

Li aliyê din gelê Filîstînî hatina Wezîrê Karê Derve yê DYA Warren Christopher ya Rojhilata Navîn protesto kir. Serokê heyeta hevdîtinên aştiya nav Rojhilata Navîn yê Filîstînî Haydar Abdül Şafî jî da xuyan ku ewê bi Warren Christopher re nepeyive. Şafî êrîşa Îsraîl a li ser Lubnanê protesto kir û tewra Amerîkayê jî wiha nixand: "Em di tewra Amerîka de tu guherîne nabînin."

## Dildarên çekên kîmyewî

Bi amadekariyên qetlîamên girseyî yê dewleta Tirk re, hin rayedarên dewletê û serbazên ordiyê, ji bo bikaranîna çekên kîmyewî, dîtînen xwe ji roj-nameyan re pêşkêş dikin. Cara yekemîn, nivîskarê roj-nameya "Hürriyet"ê Emin Çölaşan, nameyeke serbazekî Tirk ku li Kurdistanê ye, di qorziya xwe de weşand. Serbaz bi awayekî vekirî, ordiyê dawetî bikaranîna çekên kîmyewî dike. Rojnamevan Emin Çölaşan jî, bi weşandina vê nameyê, di rastiyê de daxwaza gelek mirovên Tirk ku wek rewşenbîr û nivîskar têne nasîn anî cih. Dû re jî Waliyê Edenê Naci Parmaksız, di civîna xwe ya bi muxtarên taxên Edenê de, niyeta xwe ya qirkirinê girseyî pêşkêş kir. Naci Parmaksız, di axaftina xwe de wiha dibêje: "Ger em bixwazin, di nava saetekê de dikarin 5 hezar kesî bikujin. Ger pêwîst be, em dikarin mîna qetlîama Helebçe, qetlîamê jî bikin. Dema kêr giha hestî em dê vê qetlîamê bikin". Hêzên dewletê, di gelek operasyonên li hember gerîla de, çekên kîmyewî bikar anîbûn. Cara paşî li Mereşê, di operasyonên çiyayê Nûrheqê de, li hember gerîla ev çek hatin bikaranîn û 19 gerîla bi çekên kîmyewî hatin kuştin. Lê ev cara yekemîn e ku, ji devên rayedarên dewletê ev yek bi awayekî eşkere tê diyarkirin û ji bo li hember gel jî bikaranîna çekên kîmyewî, daxwaz têne pêşkêşkirin.

## Li Stenbolê 4 kes ji aliyê ARGK'ê ve hatin kuştin

Li Stenbolê, li taxa Gazîosmanpaşa 1 li Gebzeyê jî 3 kes, ji ber ku hevkarîya dewletê dikirin, ji aliyê ERNK û ARGK'ê ve hatin kuştin. Her sê kesên ku roja 3'yê Tebaxê li Gebzeyê hatin kuştin, ji Dihokê (Erûh) bûn. Piştî kuştina Huseyîn Kaya (45) kurê wî Davut Kaya (18) û zavayê wî Abdullah Ertaş (39) mirovek li ser navê ERNK'ê li rojnameyan geriya û daxuyand ku ev hersê kes, ji ber ku li hember xebatên partiyê radibûn û van xebatan vala derdixistî hatine kuştin. Li Stenbolê jî, mirovek ji aliyê gerîlayên ARGK'ê ve hate kuştin. Li gor agahiyan Abdullah Polat, li taxa Gazîosmanpaşa, ajaniya dewletê dikir û ji ber vê yekê jî, ji aliyê ARGK'ê ve hate cezakirin.

# Kampanyaya DEP'ê: 'Aştiya Topyekûn'

● Di 2'ê Tebaxa 1993'yan de li Stenbolê, li Meydana Sultanahmetê, bi pêşengiya DEP'ê gelek hunermend, nûnerên rêxistinên girseyî yê demokratîk û rewşenbîran bi navê 'Banga Aştiyê' daxuyaniyek belav kirin û kampanyayek dan dest pê kirin. Kampanya heta 'Roja Aştiya Cihanê' wê bidome.

**Navenda Nûçeyan-** Di 2'ê Tebaxa 1993'yan de li Stenbolê, li Meydana Sultanahmetê, bi pêşengiya DEP'ê gelek hunermend, nûnerên rêxistinên girseyî yê demokratîk û rewşenbîran bi navê 'Banga Aştiyê' daxuyaniyek belav kirin û kampanyayek dan dest pê kirin. Dû re Serokê Giştî yê DEP'ê Yaşar Kaya li meydanê daxuyaniyek xwend û got ku, kampanya heta 'Roja Aştiya Cihanê' yanî 1'ê Îlonê wê bidome.

Serokê Giştî yê DEP'ê Yaşar Kaya, Mebûsên DEP'ê Ali Yiğit, Mehmet Sincar, Zübeyir Aydar, Selim Sadak, Mebûsên Enqerê yê SHP'ê Salman Kaya, hunermend Bilgesu Erenus, Yalçın Küçük, Prof. Dr. Mahîr Kaynak, Serokê Navenda Çanda Mezopotamyayê İbrahim Gürbüz, Çigirê Serokê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan (İHD) û Serokê Şûbeya Stenbolê Ercan Kanar, Serokê Giştî yê Tûm-Bel-Sen Vicdan Baykara, Serokê Şûbeya numreya 1. yê Stenbolê yê Egitim-İş'ê Mehmet Çimen, endamê heyeta rêveberîya Egit-Sen'ê û gelek partîvan beşdarî belavkirina daxuyaniyê bûn.

Daxuyani bi sernivîsa "Banga Aştiyê ya Partiya Demokra-

siyê" dest pê dike û wiha dom dike:

"Pirsgirêka wî welatî bi metodên antidemokratîk nayên helkin. Îro li welatê me şerekî nebinavkirî, neşankirî tê meşandin.

"Her roj di şer de 30 mirovên me dimirin. Bi destpêkirina şer û heta niha 17.700 mirovên me mirine. Nêzikî 400 gund hatine valakirin an jî şewitandin. Bi milyonan mirov ji axa xwe hatine veqetandin, sirgûn kirin. Ji bo mesrefa şerê qirêj, ji berîka mirovên feqîr bi milyonan pere hate derxistin.

"Pirsgirêka Kurdan, bi qetlîaman, sirgûnan, înkaran hel bûbûna, heta niha gerek e hel bûbûna.

"Li dijî şer, parastina aştiyê peywira mirovatîyê ye. Ji ber vê yekê li dijî "Şerê Topyekûn" "Aştiya Topyekûn" biparêzin.

"Ji bo vê jî lazim e dengê sîlehan bê birîn. Gerek e PKK û dewlet şer bidin sekinandin, û qerarên xwe jî bînin cih."

Ji bo helkirina pirsgirêka Kurdan 15 madde di vê daxuyaniyê de cih girtibû. Di nav van maddeyan de;

- Vekirina riyên hevditîne bi nûnerên meşrû yê Kurdan re, -Naskirina nasnameya Kurdan,



Serokê DEP'ê Yaşar Kaya, di xwendina daxuyaniya 'Aştiya Topyekûn' de.

-Rakirina Rêveberîya Taybetî, -Ji herêman kişandina tîmên taybetî, -Ronîkirina cînayetên failê wî nediyar, -Rakirina "Zagona Antî-Terror", -Îlankirina efûya giştî, -Ji nû ve avakirina gundên ku hatibûn valakirin û şewitandin û hwd. hebûn.

Piştî xwendina daxuyaniyê, Yaşar Kaya li ser revandina rojnamevanê Özgür Gündemê Ferhat Tepe agahî da. Li dû vê agahdarkirinê fişortên ku li serê "Ne şer, çareserkirina demokratîk", "Niha aşî" dinivîse, ji aliyê mebûsan ve hate lixwekirin û daxuyani li gel hate belavkirin.

Serokê DEP'ê Yaşar Kaya û heyetên DEP'ê bi hev re rojnameyên rojane ziyaret kirin ku der heqê kampanyayê de agahiyê bidin wan.

Heyeta DEP'ê pêşî rojnameya Hürriyet'ê ziyaret kir û li wir bi sernivîskar Oktay Ekşi re xebat dan. Yaşar Kaya, xwestina biratî û aştiyê ya gelê Kurd û

Tirkan anî ziman û wiha got: "Zarokên ku dimirin yê herdu aliyên jî zarokên me ne."

Li ser vê yekê jî Oktay Ekşi, "Birêz Kaya, gelên Kurd û Tirk dibêje, ez ne di vê dîtîne de me ku civaka me bi gotinên wek "gelê Kurd û gelê Tirk" bê binavkirin. Ev nêrîn kêrekî dixê navbera Kurd û Tirkan. Ez tiştên wek gelê Kurd qebûl nakim, lê ez realîteya wan nas dikim" got.

Ekşi dîtînen xwe yê der barê meşandina asîmilasyona li ser Kurdan de wiha anî zimên: "Asîmilasyon di giş welatan de çêdibin. Dewletên ku îdia dikin ku asîmilasyonê çênakin, derewan dikin. Lê belê ez, li dijî bikaranîna asîmilasyona ya bi şîdet im."

Dû re heyeta DEP'ê çûne ziyareta rojnameyên Cumhuriyet, Milliyet û Günaydin. Dawiyê jî Sermiftiyê Stenbolê Selahattin Kaya, hate ziyaretkirin.

## Rawestandina weşana Aydinlik'ê jî hate xwestin

**Navenda Nûçeyan-** Xwestin weşana rojnameya Aydinlikê bi daxwaznameya Dozgerê Dadgeha Ewlekariya Dewletê ku Ünal Erdem amade kiribû, bigrin. Li gor îdianameya Ünal Erdem nivîsa bi sernavê "Rêxistin qanûn çêkir, bacê danî PKK weke îqtidareke herêmî ye" ku di 17'ê Hezîrana 1993'yan de di Aydinlikê de hatibû weşandin bû sedem ji daxwaza biryara girtina rojnameyê re. Berpirsi-

yarê rojnameya Aydinlikê Hale Soysu diyar kir ku ev biryara DDE yê ji Qanûna Têkoşîna li dijî Terorê, madeya duyemînê hukum digirê. Ev madeya duyemînê di dema 12'ê îlonê de hatiyê ser Qanûna Çapemeniyê.

Di van demên dawî de zordestiya li ser çapemeniya sosyalîst her diçe bêhtir dibe. Çapemeniya paşverû ya Tirk piştî birîngiya Serleşkerê Artêşa Tirk Doğan Güreş ku daxwaziya

kêmnivîsîna nûçeyên der barê şerê li Kurdistanê ji wan kiribû û bi vir ve veqet dengê xwe birîn.

Li hember vê, çapemeniya muxalîf ya sosyalîst ji ber ku li gor normên çapemeniya objektîf xebatên xwe didomîne, ji zordestiya dewletê nafilite. Wekî tê zanîn berî demê girtina rojnameya Özgür Gündemê jî hatibû xwestin lê biryara mehkemê hatibû taloqkirin. Xeynî wî

girtin û revandina rojnamevanan didome. Ev heye heftiyek zêde ku nûçeyanê Gündemê yê Bilîsê Ferhat Tepe hatiye revandin û his jê nayê. Nûnerê rojnameya Azadî yê Tetwanê Beşîr Günden jî di 2'yê Tebaxê de li ser rîya Bilîsê tê binçavkirin.

Nûçeyanên kovara Özgür Gelecek Hüseyin Bektaş, Memik Horoz û Seyîthan Aslan jî li Kayserî hatin girtin.

Çakmur berendamiyên xwe îlan kirin.

## Di kongreyên SHP'ê de dubendî

**Navenda Nûçeyan-** Ber bi kongreya mezin ya di meha Îlonê de, li bajar û navçeyên Tirkiyê kongreyên SHP'ê didomin. Di kongreyên SHP'ê de, li ser rewşa Tirkiyê û kirinên dewletê yê anti-demokratîk guftûgoyên mezin çêdibin. Endamên SHP'ê û delegeyên kongreyan, di van kirinan de berpirsiyariya SHP'ê tinî ziman û vê yekê protesto dikin.

Kongreya SHP'ê ya çaremîn ji bo bidestxistina rêveberîya SHP'ê, di navbera berendamên serokatiya giştî de jî dibê qada şer û her yek dixwaze li bajar û navçeyan berendamên xwe bide hilbijartin. Piştî Serokê Giştî yê SHP'ê Erdal İnönü daxuyand ku, dê di kongreya mezin de ji bo sero-

katiyê nebe berendam di nava SHP'ê de tevliheviyek mezin derkete holê û her hêz berendamê xwe da pêş. Heta niha ji bo serokatiya giştî navê 3 kesan derbas dibe. Cara pêşîn Serokê Beledîya Enqerê Murat Karayalçın berendamîya xwe îlan kir. Dû re jî, mebûsê SHP'ê Aydın Güven Gürkan û serokê Beledîya İzmirê Yüksel

### KONGREYA STENBOLÊ


Ji bo serokatiya SHP'ê ya bajarê Stenbolê Yüksel Çengel careke din hate hilbijartin. Ji bo serokatiya SHP'a Stenbolê serokê kevin Yüksel Çengel 255, Kenan Sönmez 229, Aykut Firat 67, Bakî Nêdim Baltacı 13 û Hikmet Avşar 1 deng standin. Li gorî vê Yüksel Çengel careke din ji bo serokatiya Stenbolê hate hilbijartin.

# 'Kurdistana Bakur navenda xebata rizgarîxwaziya milletê Kurd e'

● Ez bi çavekî pozîtîv mêzeyî têkoşîna gelê Kurd li Kurdistanê dikim. Bi taybetî di rewşa niha de, bawer im dinya hêdî hêdî nêzikî meseleya Kurd dibe. Ew nêzikbûna li ser meseleya Kurd faktorekî gelek girîng e, ku em bikaribin jê feyde bibînin. Ez bi çavekî gelek hêvî mêzeyî xebata Kurdistana Bakur dikim. Di navbera vî beşê Kurdistanê û yên din ên Kurdistanê de hem ji aliyê slogan û hem jî li aliyê qudretî ve, ferqekî gelek mezin heye. Ez wilo bawer dikim ku Kurdistana Bakur navenda xebata rizgarîxwaziya milletê Kurd e.



Emîr Gazî



Efat Gazî

Kurdistanê dikim. Bi taybetî di rewşa niha de, bawer im dinya hêdî hêdî nêzikî meseleya Kurd dibe. Ew nêzikbûna li ser meseleya Kurd faktorekî gelek girîng e, ku em bikaribin jê feyde bibînin. Ez bi çavekî gelek hêvî mêzeyî xebata Kurdistana Bakur dikim. Di navbera vî beşê Kurdistanê û yên din ên Kurdistanê de hem ji aliyê slogan û hem jî ji aliyê qudretî ve, ferqekî gelek mezin heye. Ez wilo bawer dikim ku Kurdistana Bakur navenda xebata rizgarîxwaziya milletê Kurd e.

Birêz Emîr Gazî, hûn dikarin xwe bi me bidin nasîkirin?

- Ez di sala 1938'an de, li gundekî nêzikê bajarê Mehabadê ji dayîka xwe bûm. Min xwendina xwe ya yekemîn li bajarê Bokanê, xwendina navîn li bajarê Mehabadê û Fakulteya Hîqûqê jî li Tewrêz û Tehranê xwendibû. Dema min dest bi xwendinê kir, têkiliyên min bi pirsra rizgariya neteweya Kurd re çêbû. Heta roja îro jî, ez li ser wê xeta siyasî dixebitim.

Ez li ser paşnavê malbata we dixwazim bisekinim, ji ber ku paşnavê we Gazî Mihemed tîne bira min. Tu mirovatiya we bi Gazî Mihemed re heye?

- Belê, ez bi xwe ji malbata Gazî Mihemed im. Bavê min û Gazî Mihemed pismamê hevdu ne. Ez bi xwe jî, zavayê wî me.

Îro li rojhilatê Kurdistanê partiyên cur be cur hene û hûn Serokê Partiya Serxwebûna Kurdistanê ne, politîka û nêrinên partiya we çi ne?

- Partiya Serxwebûna Kurdistanê, xebata xwe ji bo hemû Kurdistanê dike û partiyeke Kurdistanî ye. Partiya Serxwebûna Kurdistanê, tenê ne ji bo Kurdistanê ye. Fikrên partiya me, ji bo rizgarî û serxwebûna hemû Kurd û Kurdistanê ne. Baweriya me wilo ye. Heta milletê me serxwebûna xwe nede qe-

bûlkirin pêşve naçe û tu caran heqê xwe nastîne. Baweriya me ew e ku, xebata serxwebûnê ji bo milletê me, xebateke siyasî, demokratîk, pluralîst û însanî ye. Em ne li dijî otonomî û reforman in, di rastiya xwe de ew ne heqê siyasiya milletê me ye. Heqê milletê me yê giştî bi serxwebûna milletê me çêdibe.

Hûn dikarin bi kurtî behsa Komara Kurdistanê (Mehabadê) ya 1945-46'an bikin?

- Komara Kurdistanê li salên 1945-46'an li Kurdistanê rojhilatê pêk hat. Ew dem paş Şerê Cihanê yê Duyemîn bû. Îran ji aliyê hêzên hevgerî ve hatibû dagirkirin. Milletê me li Kurdis-

tana Rojhilatê ew hal û mecal bi qezenca xwe girt û dewleta xwe ya serbixwe pêk anî. Wê çaxê beşek ji Kurdistana Rojhilat li bindestê Sovyetê bû. Ew jî, ji bo Komara Kurdistanê bû pirsgerêkek. Bi wî awayî Komara Kurdistanê pêk hat û armanca wê komarê ew bû ku, ew bibe bingehê ji bo rizgariya beşên Kurdistanê yên din re jî. Mixabin, temenê (emrê) Komara Kurdistanê dirêj nebû û yanzdeh meh jiya. Ji ber ku Sovyet, di bin tesîra politîka cîhanê de ma û piştgiriya xwe kişand, gûşarên Îngilîz, Amerîka û Îran karekî wilo kir, Komara Kurdistanê xwe nikaribû biparêze. Komara Kurdistanê komareke gelî bû. Di nav wan yanzdeh mehan de, ji bo gelê xwe, gelek kar û xebatên hêja pêk anî. Wekî mînak; avakirina mekteban bi Kurdî, ordiya Kurd, derxistina 22 rojname û kovaran, pêkanîna Yekîtiya Jinan, şandina zêdetirê 180 xwendevanan ji bo xwendina cur be cur li Sovyetê, Piştî têkçûna Komara Kurdistanê, Serokê Komarê, di roja 10'ê Adara 1946'an de, hate îdamkirin. Komara Kurdistanê, ji bo gelê Kurd, serkeftineke gelekî mezin bû.

Hûn li têkoşîna Kurdistanê çawa dinêrin û bi taybetî jî li têkoşîna Bakurê Kurdistanê?

- Ez bi çavekî pozîtîv mêzeyî têkoşîna gelê Kurd li

Demeke dirêj e ku hûn li sirgûnê ne, hûn dikarin bi kurtî behsa komploya li dijî we û jina we hatibû çêkirin bisekinin?

- Hûn dizanin hikûmeta dagirker a Îranê, li derveyê welêt jî reşekûjî (teror) dike û bêhtir xebatkarên Kurd dibin hedefê vê reşekûjiyê. Gelek nimûne ji bo vê terrore li ber çavên me ne. Yek ji wan, ew e ku di 6'ê meha Îlona 1990'î de bombyekî gelek bi hêz, ji bo kuştina min danîbûn hundirê qutiya posta min. Wê rojê jina min, Efat Gazî ji karê xwe zûtir vedigere malê û dixwaze qutiya postayê veke, dema vedike bomba diteqê û ew birîndar dibe, piştî du saetan li nexweşxaneyê şehîd dibe.

Ji xwendevanên Welat re tu mesajên we hene?

- Daxwaza min ji bo gelê Kurd û rojnameya Welat ew e ku, di xebata xwe de serkeftî bibin, xebata rojnameya Welat gelek tiştêkî girîng e, ji ber ku yekemîn car e rojnameyêke Kurdî, li Kurdistana Bakur bi vî rengî derdikeve. Rojnameya Welat hem ji aliyê ferheng, kultur, ziman û hem jî ji aliyê xebata siyasî ve rolekî mezin dileyîze. Hêvîdar im rojnameya Welat di vê wezîfeya xwe ya girîng de bi serkeve!

**Heupeyvîn:  
Bêrîvana Dêrsimî**

## Nivîskarê Welat Huseyîn Denîz

Rêhevalê delal birayê me yê şîrîn 9'ê Tebaxê sala 92'yan li bajarê Serêkaniyê (Ceylanpınar) bi destê xayîn û nezanan ve hate qetilkirin.

Birayê delal, ev salek e ku tu ne di nav me de yî. Tê her dem di dilê me de jiyana bibî.

Em rêça te ber nadin.

*Li ser navê malbata wî  
xwişk û birayên wî  
Mahsun, Adîle û Newroz Denîz*

## Heval Huseyîn tu namirî

Tu şehîdê azad î  
Te ji bo Kurdan soz danî  
Te soza xwe pêk anî  
Huseyîn tu mamosta bûy  
Nivîskar û zana bûy  
Hevalê rêça rast bûy  
Te ji bo rastiye can dabû  
Qeşema te çeka te bû  
Gotina te gulle bû  
Tu kelemê çavê dijmin  
Awaz û dengê me bûy  
Îro 9'ê Tebaxê  
Xwîna te li erdê nakê  
Em vê rojê jî bîr nakin  
Ta em sax bin li dinê.

**Adîle Denîz**



Ger hûn çêj (tam) ji berhemên girîng ên hunerî nastînin, zanibin ku hûn zêde bi edet û pêşdarazan (peşin hûkûm) ve girêdayî ne.

E.H. Gomrich

## Tajiya bi namûs!

Bavê min ji nêçîrê pirr hez dikir. Tajiyeke wî yê pirr qenc hebû. Wî ji tajiye xwe zehf hez dikir. Rojêkê ez çûm kadîne ji bo ku em bi-dim sewalan. Min dît ku kevroskek ketiye kadîne. Min got: "Bavo kevroskek ketiye kadîna me." Bavê min got: "Lawo, ku kevrosk ketibe kadîne, ev ne ji ber xurtbûn û jêhatîbûna kevroskê, lê ji bênamûsiya tajiye me ye."

Ger welatê me jî ketibe bin lingê neyaran, ev ne ji jêhatîbûna wan, lê ji ber xa-

yintiya axa, beg û kesên Înan û hwd. ne.

Alî Bekiran



## Pêşniyarek ji dewletê re

Marzê pardon yanê Mirzê Tansu Xanim, bi hewldanê nû hate ser kar. Ev pîrik (!) dixwaze nav û dengê xwe li dîne bihêle û karên ku kesî nekirine bike. Îcra-teke xwe ya bi vî rengî jî pêk anî. Di dîroka KT (TC)ê de cara yekemîn, civîna Heyeta Wezîran li Culemergê çêbû. Di Tirkî de gotinek heye, "Allahim sen nelere kadîrsîn." Ango Xwedêyo tu çiqas mezin î. Tu karî her celeb tiştan pêk bînî. Niha jî em karin bi kurtahî bibêjin: "Gerîlla sen nelere kadîrsîn."

Em bèn ser pêşniyara

xwe. Tansu (Bi rastî jî wek ava berbangê ye) xanim dixwaze li derveyî Tirkîyê sazgeheke nû ji bo îstixbaratê damezirîne. Lê hîn nav lê nekiriye. Wek tê zanîn navê sazgeha îstixbarata Tirkan MÎT e û ew tîpa M'yê ya serî di wateya millî (neteweyî) de ye. Divê navê ya nû jî nêzikî vî navî be. Ez dibêjim ji ber ku, nûnerên dewletê dibêjin; "Em di nava Asya û Ewrûpayê de wek pirekê ne", bila navê vî jî bi vî rengî be. Min xwe di vî karê milî de berpirsiyar dît û jê re navek dît: Intelligence Teşkilat.


Intelligence bi Îngilîzî, Teşkilat bi Erebi ye. Kurtahiya wê jî "ÎT" e. Ez tika dikim ku pîreka me pardon yanê pîrika me vê pêşniyara min biperjirîne.

**Nîşe:** Min ew taktîk ji **Gurza** Engîn Ardiç hilgirt. Wî zalimî pardon yanê wî zilamî xwedêgiravî di şîroveya xwe de dema greva karkerên belediyeyê digot; "çöpçü" pardon yanê karkerên paqiyî û wisa jî bi karkeran tinazê xwe dikirin.

**Mîrza:** Kurê mîr

**Mîrzê:** Keça mîr

Samî Tan



## TÎR

Musa Anter



### Huseyîn

Huseyîn lawo, Huseyîn lawo, ma ezê bibêjim çi? Xelk ji kûçikên xwe yên mirî re jî dibê "şehîd", lê ji te re dibêjin "terorîst". Süleyman Demîrel dibêje: "Ev ên ku tîn kuştin ne rojnamevan in, hemû terorîst in. Hê doh şeş cendirme kuştin, ma cendirme ne xwîn e." Yanî mîrik eşkere dibêje, ew cendirmê me dikujin, em jî wan dikujin. Û hê jî em dibêjin, em qatilê xwe nas nakin, yanî wekî ku Tirk dibêjin "faili meçhul cinayet". Ma meçhul, yanî nezanî di vî îşî de heye? Süleyman Demîrel bi devê xwe dibêje "qatil ez im". Êdî nalet li wî Kurdî bê ku raya xwe bide qatilê xwe, yanî Süleyman Demîrel û partiya wî.

Can Huseyîn! Bi Xwedê devê min nagere ku ez qala şehîdiya te bikim û destê min jî qelemê nagire. Lê ez ji te re soz didim, berê min yek dinivîsî, lê ezê ji niha pê ve, ji bedêla te ve jî binivîsim. Elhemdulillah tu

**Kurdên me yên nezan, xwe dane dora Silo û Silo li me kirine bela. Di boxçika Süleyman de, çekekî (kincekî) paqij tune ye, giş dujin in, bi Tirkî dibêjin "kirlî çamaşır". Lê ma ezê çi bibêjim? Tevî vî awayî hin ew ji me re dibêjin, "eşqiya" û "terorîst".**

ne kurdunde yî, te çû Dicle û Firad û birayê wan ê din û xwişka wan a din ji me re hişt. Lê î-ro Süleymanê ku du emrê te kiriye bimire, elhemdulillah kurdunde ye û malê wî yê heram jî, wê ji biraziyê wî yê diz Yahya Demîrel re bimîne. Lê ma ezê çi bikim? Kurdên me

yên nezan, xwe dane dora Silo û Silo li me kirine bela. Di boxçika Süleyman de, çekekî (kincekî) paqij tune ye, giş dujin in, bi Tirkî dibêjin "kirlî çamaşır". Lê ma ezê çi bibêjim? Tevî vî awayî hin ew ji me re dibêjin, "eşqiya" û "terorîst".

Ne min got ez hew karim binivîsim, ma ezê bibêjim rehma Xwedê li te be, jixwe tu rehm î, tu şehîdê welatê xwe Kurdistanê yî.

**Jêrenot:** Apê Mûsa ev nivîs li ser şehîdbûna Huseyîn Deniz nivîsîbû. Di hejmara Welat ya sala bihurî de hatibû weşandin. Em bêguhertin pêşkêş dikin.

Nivîskar û welatparêzên hêja

### Xalê Mûsa Anter û Huseyîn Deniz

Bi destê dewleta mêtînger bi xiyaretê beriya vê salekê di rojê meha Tebaxê de hatin qirkirin. Xwîna herdu şehîdan ji bo çanda Kurd û Kurdistanê bû ava jiyana bêdawî. Emê her dem di têkoşîna rizgariya neteweyî de bîranîna wan bijîn û bi avakirina welatekî serbixwe û azad ve armanca wan pêk bînin. Pêwîst e di şerên gelan de mirov ji dayîna şehîdan netirse, lê ji sekinandina wê bitirse. Em bi şehadeta wan di sala yekemîn de bêhtir serbilind, azad û nêzikî azadiyê ne.

Li ser navê malbat û hevalên wan  
Hasan Deniz

# Sîstema cerdevaniyê dipelişe

● *Bi hev dankuştina gelê Kurd ji mêj ve metodeke dewleta Rom e. Hîna di dema Evdilhemîdê II. de dewleta Osmanî bi navê "Alayên Hemîdî" Kurdên nezan û cahil dixistin bin hîmayeya xwe û berê wan didan gelê Kurd. Bi wê metodê hem dijîti di nav gel de derdixist hem jî kontrolkirina serhildan û tevgerên azadiyê ji xwe re hêsan dikir.*

● *Îro jî dewleta Tirk bi eynî metodî dixwaze têkoşîna rizgariya neteweyî ya gelê Kurd bi hêz û alikariya cerdevanan bisekinîne û biperçiqîne. Bes, Partiya Karkerên Kurdistanê bi metodên şoreşgerî hemû hêviya dewleta Tirk dişkîne û roj bi roj sîstema cerdevaniyê ji hev dixîne.*

**Navenda Nûçeyan-** Ji hêzên dewleta Tirk yeke herî girîng, sîstema cerdevaniyê ku li Kurdistanê li dij PKK'ê tê bikaranîn di van hefteyên dawî de ber bi hilweşandinê ve diçe. Bi taybetî ji destpêka meha Hezîranê ku hêzên ARGK'ê êrişên ser cerdevanan ji xwe re wek hedefa yekemîn îlan kirin ve, hejmara cerdevanên ku îstifa dikin roj bi roj zêdetir dibin. Cerdevanên ku li ber xwe didin û dev ji çekên dewletê bernadin ji aliyê hêzên ARGK'ê ve bi awayên sert û dijwar tînan cezakirin. Nimûneyeke dawî ji van êrişên ARGK'ê bûyera Motkê ye. Roja 4'ê Tebaxê gerilayên ARGK'ê 32 cerdevanên ji Motkê ku li ser Bilisê ye kuştin 15 heb jî birîndar kirin.

Di meha Tîrmehê de zêdeyî hezar cerdevanan dev ji çek berdan. Bi hezaran cerdevanên din jî dixwazin îstifa bikin lê dewlet îstifaya wan qebûl nake û bi darê zorê cahşîtiyê bi wan dide kirin. Bi taybetî li hêla Cûlemêrgê, li Agirî û li Xerzan kesên dev ji cerdevaniyê berdînin pîr in.

Di meha Tîrmehê de ji gundên li ser Agirî, Beyazîd, Sason, Erganî, Yuksekova, Çukurca û Baykan cerdevanan kom bi kom dev ji çekên xwe

berdan û poşmaniya xwe anîn ziman ji ber ku heta niha li dij gelê xwe li tenişt dewleta Tirk şer kirine. Cerdevanên dev ji çekên dewletê berdidin û poşmaniya xwe tînan zimên, ji aliyê PKK'ê ve tînan efûkirin. Li aliyê din, dema ku ev kes dev ji hevalbendîya Komara Tirk berdidin, ji aliyê hêzên dewletê ve neheqî li wan tê kirin. Mesela sercerdevanê berê yê gundê Meşikan ku li ser Qoserê (Kiziltepe) ye, Fereç Polat piştî ku dest ji cerdevaniyê kişand ji aliyê tîmên taybetî ve 250 pezên wî hatin telefikirin. Bes tevî van êrişên dewletê ev cerdevanên berê, dilxwazî û aligirîya xwe ji bo PKK'ê tînan ziman. Zehfên van kesên ku berê hevalbendê dewletê bûn û niha dijberîya wê dikin dîtinên xwe wiha diyar dikin: "Me di destpêkê de ji ber xizantiyê ji bo nanê xwe û ji bo meaş çekên dewletê hilgirtin. Lê paşî em pê hisiyay ku dewleta Tirk dixwaze me û gelê me bi hev bide kuştin. Dewletê ji me dixwest ku em her cure xerabî û bênamûsiyê bi gelê xwe re bikin. Bes em êdî di zanîna vî rastiyê de ne û em nema dijîtiya gelê xwe û gerilayan dikin. Jixwe gerîla jî em in, zarokên me û birayên me ne. Dewlet

êdî nikare me bixapîne, em zarok û birayên xwe êdî nakujin."

## BEHDÎNAN

Di meha Tîrmehê de li gundên Cûlemêrgê û gundên navçeyên vî bajarî bi sedan cerdevan çekên xwe berdan. Ji gundên Gelîncîk, Kayalar, Zewban, Meleyan, Nerkok, Zerîç, Xusumîla û Gunyazi ku li ser Navşanê (Şemdinlî) ne, hin cerdevanên ku îstifa kirine ev in: Reşît, Muzaffer, Nuretîn, Muhyettîn, Îzettîn, Xalid, Cebraîl, Mistefa, Cemîl, Kamil, Mecral, Sadiq, Mahmut, Ezîz-xan Şenlik, Abdullah û Kerem Çiftçi.

Ji şeş gundên Geverê (Yuksekoşa), (Ayir, Baştaşir, Xaciyay, Weregaz, Bestik, Taşyazi) jî 140 cerdevanan çek berdan. Ji gundê Çinarî ku li ser Çukurcayê ye ji malbatên Taş, Gergîn, Duman, Sönmez, Türkeş, Avci, Akar, Özdenç, Çakir û Cîhangîr hejmareke mezin îstifa çêbûn. Ji gundê Çeltikê jî çend kesan dev ji çekê dewletê berdan.

## SERHED

Li hêla Serhedê îstifaya cerdevanan êdî zehf li gundên Agirî û yên navçeyê wê Bazîdê çêbûn. Ji gundên ku li ser Agirî

ne, Haleksan, Ewdê, Aşkale, Mamik, Kasûr, Sabuncu, Cımka, Keşîş, Kayabey, Dareba jor, Arenos, Keşîşa Jêr gelek cerdevanan îstifa kirin. Ji yên ku me navên wan tesbît kirine: Hamît Koçkan, Mehmet Edîz, Nesîm Atabey, Ahmet Taşir, Mehmet Kelkusa, İsmail Demîr, Muhsîn Erden, Ali Mızral, İhsan Bulut, Maksut Turan, Etem Çetîn.

Ji gundên li ser Patnosê (Korxan, Taşkin, Babya, Çakîrbey) ji malbatên Yalvaç, Taştan, Sevînc 44 kesan îstifa kirin. Ji gundê Agirî, Hamurê 5 îstifayên din çêbûn. Dîsa ji gundên Çata, Alîpaşa, Sarica, Bijminik (Yorgun Söğüt), Goma Şamo, Goma Remo û Ferixbaxê ku yên Agirî ne ji malbatên paşnavên wan Aydin, Demîr, Kiliç, Bozkurt, Budak, Sarica û Kaya ne 58 kesan meha çûyî îstifa kirin.

Li Agirî, ji xeynî 125 cerdevanên gundê Xarîk ê Bazîdê hemû cerdevanan an dev ji çek berdan an jî li pey îstifayê digerin. Tenê di meha Tîrmehê de li hêla Agirî nêzîkî 450 kesan sîleh berdan.

## XERZAN

Wekî din, ji gundên Sasos Gidorniyê (Taşyayla) Guvencik

jî, ji malbata Yılmaz hejmarek kes îstifa kirin.

Li gundêki Baykan, Çelîklî (Baginê) ji malbatên Okay, Baysal û Demircî 26 îstifa.

Ji Motkê, gundên Sesar, Uris, Kayferan û Meydanê 55 îstifa, li Xerzan îstifayên cerdevanan berdeham in.

## AMED

Li herêma Amedê jî îstifaya cerdevanan zêde dibin. Ji gundên li ser Egilê, Bexşiyay û Bozuvan gelek cerdevan dixwazin îstifa bikin bes dewlet wan tehdît dike û bi darê zorê vî karî bi wan dide kirin.

Ji xeynî van deveran, li gelek deverên din yên wek Sürûç, Kiziltepe, Silopî û Dihê bi hezaran cerdevan dixwazin dev ji çekên dewletê berdin.

PKK her tim bangî cerdevan dike ku dev ji hevalbendîya dewletê berdin. Tevî vî bangê, kesên ku bi dilxwazî cerdevaniyê didomînin û ji bo îstifayê hewl nadin xwe, ji aliyên gerilayên ARGK'ê ve tînan cezakirin.

Cerdevaniya ku dewleta Tirk dil û piştî xwe zêde pê germ dikir bi îstifayên dawî û bi êrişên PKK'ê hêza xwe ya berê wînda dike û gav bi gav ber bi hilweşînê ve diçe.

## Yekîtiya êzîdiyan hate damezirandin

### Mamoste Emîn

**Bremen, Welat:-** Xebata vakirina yekîtiya êzîdiyan ya ku berî çar mehan dest pê kiribû, di civîna 31 Tîrmehê 1993'an de li bajarê Celle hat çêkirin de, gihîşt merhaleyê gelekî binirx.

Zêdeyî sed kesên ji hêla Komîteya Amadekar ve hatibûn dawetkirin beşdar bûn. Di nav wan de gelek Şêx, Pîr, Pêşiman û Feqî jî hebûn. Endamê Parlamenta Kurdistana Başûr, Xerî Beg mewanê rûmetê bû. Di axaftina xwe de gelek tiştên balkêş anîn zimên.

Di civînê de li ser sedemên valakirina welat, rewşa êzîdiyên li Ewropa, pirsgerêkên wan û çereserkirina van pirsan hate sekinandin.

Li ser pirsên welat, sedemên damezirandina Yekîtiya Êzîdiyan ji hêla komîteya amadekar ve wiha hat şirovekirin: "Sedemên damazrandina vî yekîtiyê gelek in. Yên bingehîn ev in.

1. Wek tînan zanîn êzîdîtiyê berdewama ola zerdeştî ye. Zerdeştî jî ola Kurdan a yekemîn e. Êzîdîtiyê îro di hoyên Ewropa de di navbera hebûn û tunebûnê de ye. Ji ber vî jî divê tiştina ji bo parastina êzîdîtiyê bikin.

2. Gelek kesên kevneperest êzîdîtiyê xistine çavkaniya ticaretê. Ji bo mexsedên xwe yên kesaniyê bi ol û erkanên me yên ji bo wan bi sedsalan cefa kişandine, dileyizin. Divê em êdî misadê nedin wan.

3. Ji ber ku tiştên me yên

olî zehf nivisandî tunin, kesên li Ewropa mezin bûne bawerîya wan hew bi êzîdîtiyê tê. Ji ber vî yekê jî her roj keç û xortên me dev ji malbatên xwe berdidin û digihîjin Almanan. Divê em tiştên bersiva demê bidin derxin, da ku em karibin wan li ser urf, edet û çanda xwe bidin sekinandin.

4. Pelên dîroka neyartiya dehsalan berî vîga hatibûn girtin, cardin tînan vekirin. Mirovên me li ser axa Ewropa li ser tiştên pûç hev dikujin û neyartiyê gur dikin. Berî her tiştî divê em li hemberî neyartiyê dîwarekî bihûnin.

Di mehên pêşiya me de, piştî civînên mezin yên bi gel re, dê li Celle, Bremen, Bielefeld û Emerich sazûmanên yekîtiyê bînan avakirin.

## Em şehîdê xwe bi bîr tînin

### Nivîskarê me yê hêja Huseyîn Denîz

roja 9'ê Tebaxa 92'yan li Serêkaniyê ji hêla kontrgerîla ve hatibû qetilkirin. Wî heta nefesa xwe ya dawî pênûsa xwe di rîya azadkirina gelê Kurd û serxwebûna Kurdistanê de şixuland.

Dema şehîd ket Apê Musa li pey wî wiha gotibû: "Huseyîn lawo ez sond dixwim ku ez pênûsa te li erdê nahêlim." Em jî sond dixwin ku pênûs û heyfa şehîdên xwe li erdê nahêlin.

Rojnameya Welat



## Li Dihokê cînayeteke din

**Navenda Nûçeyan-** Li Kurdistana Başûr, Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Zehmetkêşên Kurdistan, Kaîz Muhamed (Rênas) hate kuştin. Rênas, bi destê Salah Muhamed Amedî û alîgirên wî ve hate qetilkirin. Salah Amedî çendekî berê, ji Partiya Zehmetkêşan, tevî çend hevalên xwe veqetiyabû.

Li gorî şahidan; li Dihokê, di 29'ê Tîrmehê de, Rênas li lokala Zehmetkêşan rûniştibû. Amedî û çend hevalên wî yê çekdar, tene hundir û gazî Rênas dikin. Li ser vê vexwendinê Rênas bi wan re derdikeve derve û li wir, bi sebebeke nediyar tene gullebarankirin. Piştî vê cinayetê, birayê Rênas, Ehmed Muhamed wiha got: "Rênas, bi salan e di nava têkoşîna azadiyê de bû. Bi hemû rêxistinên Kurd re têkiliyên wî hebûn. Her kesî ew nas dikir û jê hez dikir. Qatilên wî aşîkar in. Ger hikûmet van qatilan radest neke, dê bikeve bin mesûliyetê".

Sekreterê Partiya Zehmetkêşên Kurdistan Qadir Azîz jî, aşîkariya qatilan diyar kir û hikûmetê vexwendiyê pêkanîna wezîfeya wê kir.

Bi kuştina Rênas re, di nava 2 mehan de, ev bûn 4 cinayet ku li Dihokê pêk tên. Endamê YNK'ê û mebusê Dihokê Hazim Yûsufî, di axaftina xwe ya li ser vê bûyerê de, qatilan mîna "neyarên demokrasîyê binav kir û wiha got: "Ez, parlamen-toyê û hikûmetê vexwendiyê pêkanîna wezîfeyê dikim. Ji bo jiyana demokrasîyê, girtina van qatilan şert e. Ev ên ku rewşenbîrên berdevkên azadiya me dikujin, neyarên me û neyarên azadiya me ne".

Di van herdu mehên dawî de, li Dihokê, mebusê Asûrî, Serokê Rêxistina Têkoşîna û berpirsiyarê Behdînanê yê Partiya Komunîst ê Iraqê hatibûne kuştin. Lê qatilên tu yekî jî nehatibûne girtin.

# ERNK: 'Bila tûrîst neçin Tirkiyê'

**Navenda Nûçeyan-** Nûneriya ERNK'ê ya Ewropa, ji bo ku tûrîst neçin Tirkiyê bangeke nû kir. ERNK'ê di banga xwe de daxuyand ku, yek ji çavkaniyên şerê qirêjî yê ku li Kurdistana tê meşandin tûrîzm e û hem Kurdistana, hem jî Tirkiyê bûne qada şer, ji ber vê yekê jî, divê tûrîst neçin Tirkiyê.

ERNK di daxuyaniya xwe de li ser şerê li Kurdistana û tewra dewletên Ewropî jî rawestiya û daxuyand ku, ji demê ve ye, li ser PKK'ê di çapemeniya Ewropayê, de nûçe û nixandînan nerast cih digirin û ev yek ji ber tîkiliyên dewletên Ewropî û yê bi Tirkiyê re ne û Ewropa li gorî berjewendiyên xwe dilive. Wekî din, Tirkiyê bi serokwezîriya Çiller, êrîşên xwe sifitir kiriye û di demê kin de, li Kurdistana bi dehan qetlîam pêk hatine. Daxuyanî wiha didome: "Kirinên vê dewleta hov ne tenê ev in. Mirovên Kurd, ji nava kolanan tene revandin û windakirin, rojnamevanan direvînin û dikujin, ji bo ku rastiyan dinivîsin rojname tene girtin, dîsa partiyên siyasî tene girtin. Ev bi tenê çend mînak in ji bo kirinên li Kur-



Tûrîstên ku ji aliyê PKK'ê ve hatibûn dîlgirtin, bi gerilayê ARGK'ê re.

distanê.

Ewropa li hember vê wehşet û xwînê, ji ber berjewendiyên xwe bêdeng dimîne. Bi vê jî namîne, bi dîtinên KT (TC)'ê yê fermî, berxwedana meşrû ya neteweyekê mîna "terorîzm" lanse dike. Ên ku vê nixandîne dikin, dê di dirrokê de bibin berpirsiyarên

van qetlîaman"

Nûneriya ERNK'ê ya Ewropayê, ji bo berdana tûrîstên ku di destê PKK'ê de ne jî wiha got: "Binçavkirina hin tûrîstên ku li Kurdistana hatibûn girtin didome. Tirkiyê bi operasyonên xwe yê ji erdê û hewa jiyana tûrîstan diavêje talûkeyê. Divê KT dev ji van

êrîşên xwe berde. Dê partiya me di şertên musaîf de, tûrîstan vegeşîne welatên wan. Îro Kurdistana û Tirkiyê qadên şer in. Ji ber vê yekê jî bangên me yê ji bo tûrîst neçin Tirkiyê didomin. Tirkiyê vî şerê qirêjî, hinek jî, bi saya dahatûyên tûrîzmê dikare bidomîne."

## Cerdevan li berxwedana gundiyan qelibîn

**Navenda Nûçeyan-** Roja 29'ê Tîrmehê cerdevanên gundên Nilbilê, Mikrê, Sehrê û Batê ku li ser Midyad'ê ne bi armanca kuştina gundiyan bi ser gundê Nilhilê ve girtin. Lê gundiyan Nilhilê bi çekan xwe parastin û cerdevanan ji gund durr xistin. Li ser vê berxwedana gundiyan, cerdevan ji gund reviyên û ji leşkeran alîkarî xwestin.

Cara dîyemîn, leşker bi cerdevan re careke din êrîşî ser gundê Nilhilê kirin û 5 gundî bi xwe re birin.

Di êrîşa yekemîn a cerdevanan de 2 gundiyan ji gundê Nilhilê birîndar bûn, 2 mal jî hatin şewitandin.

Cerdevanên gundên Nilbilê, Mikrê, Sehrê û Batê xwe mîna gerîla didin nasîn û dikevin nava gundê Nilhilê. Dû re gundiyan li hev dicivînin û dixwazin ku gundiyan li erdê dirêj bikin. Lê gundî fêr dikin ku, ev ne gerîla, lê cerdevan in û armanca wan kuştina gundiyan in. Li ser vê gundî li hember vê daxwaza cerdevanan derdikevin û dest diavêjine çekên xwe. Di şerê navbera gundî û cerdevanan de, 2 gundî bi navên xwe Hasan Alpsoy û Fîdan Acar birîndar dibin. Di vê navê de bi gullebarana cerdevanan gelek seawalên (heywan) gundiyan jî telef bûn, 2 mal jî şewitîn.

Cerdevan li ser vê berxwedana

na gundiyan, ji gund reviyên û çûn ji leşker alîkarî xwestin. Li ser vê leşker cerdî ser gundê Nilhilê kirin û 5 gundiyan girtin. Navên gundiyan girtî ev in: Berzanî Acar, Şakîr Acar, A. Ganî Acar, Adnan Acar û Hacı Akpınar.

Ji van gundiyan girtî, ji xeynî Şakîr Acar ên din hatin berdan û heta niha der mafê wî de tu agahî nîn in.


Yek ji gundiyan Nilhilê jî, ji bo li lêzîmên xwe bipirse diçe dozgeriya Midyadê, lê bi hinceta ku 6 cerdevan hatine birîndarkirin ji aliyê dozgeriyê ve tê girtin. Ev gundî, bi navê xwe Salîh Acar hê jî di bin çav de ye.

## Di derê gumrikê de kontrola gerîla

Gerilayên ARGK'ê, Derê Gumrika Esendere ya li tixûbê Îran'ê 3 saetan kontrol kirin. Di vê livbaziyê de 2 panzer û erebeyek jî, ji aliyê gerîla ve hatin şewitandin. Derê Gumrika Esendere, 40 km ji Gever (Yüksekova) a Cûlemêrgê dûr e û di tixûbê Îran'ê de ye.

Nêzikî 300 gerilayên ARGK'ê, roja 4'ê Tebaxê danê nivro, cerdî ser derê Gumrika Esendere kirin û kesên di gumrikê de dixebitin dil girtin. Gerîla nêzikî 150 erebe sekinandin û propagandada kirin. Di vê navê de 2 panzêrên ku hatin derê gumrikê jî bêşer ketin destê gerîla. Gerîla bi bêtêla panzeran li Serleşkeriya Tabûra Geverê geriyên û wiha gotin: "Em gerilayên ARGK'ê ne û niha li Derê Gumrika Esendere ne. 150 erebe û 2 panzer di destê me de ne". Piştî vê axaftinê erebeya serbazekî û 2 panzer ji aliyê gerîla ve hatin şewitandin.

Ev livbaziya gerilayên ARGK'ê nêzikî 3 saetan domiya û tu mudaxele li wan nebû.



Ferhat Tepe

## Ferhat Tepe hê jî winda ye

Di ser revandina nûçevanê Özgür Gündemê re 11 roj derbas bûn. Heta niha ji hin telefonên fîdyexwestinê pê ve tu agahî nîn in. Bavê Ferhat Tepe, Serokê DEP'a Bilîsê Îshak Tepe, ji revandina kurê xwe, qumandanê tûgaya Tetwanê berpirsiyar digire. Qumandanê Tugayê Korkmaz Tağma, piştî revandina Ferhat Tepe xwe vedîşere û nayê zanîn ku li ku derê ye.

Li aliyê din, roja 4'ê Tebaxê,

nivê şevê mirovek li mala Îshak Tepe digere û milyarek fîdye dixwaze. Îshak Tepe li gorî daxwaza wî, di saeta ku ew dibêje de, diçe cihê ku hatiya tesbîtîkirin, lê tu kes nayê wê derê.

Grewa birçibûnê, ya ku li ser revandina Ferhat Tepe dest pê kiribû jî, li avahiya DEP'a Bilîsê didome. Grev di roja 7'an de ye. Polis rê li kesên ku ji navçe û bajarên din ji bo beşdarî grevê bibin digire û destûr nade.

# PÊNÛS



Amed Tigrîs

## Kurd û agir

Wekî ku tê zanîn agir di nav me Kurdan de gelekî pîroz e. Ev ji kûrahiya dîroka me tê. Digêhe heta dema Zerdeşt. Heger mirov olan bikole, ev ji dema Zerdeşt jî durtir diçe. Diçe digêhe heta dema olên natûrî û totemî. Bi taybetî di dema destpêka şaristaniyê de li Mezopotamya, Misir û cihên din gelekî civatên wê demê baweriya xwe bi ro, hîv û stêrkan diani. Bawer dikirin ku ji wan nebe jiyân dê vemire. Ew bîr û bawerî hema hema di hemû civatên wê demê de hebûn. Mirovên wê demê li ser kevîran, wênayên ro, hîv û stêrkan çêdikirin. Gelek civatên wê demê bawer dikirin ku agir ji ro, hîv û stêrkan ketiye an jî hatiye ruyê dinyayê. Agir ji bo mirovên wê demê gelekî girîng bû. Bi agir xwe germ dikirin, xwarinên xwe dipatîn û wekî ronahî bi kar dianîn. Heger agir vemira dê ew zivistanan jî sermayê bimiran. Bi şev di tarîtiyê de biman. Jiyan li wan dijwar dibûn.

Lê, di dema ola Zerdeşt de agir bû tiştêkî din. Bû dîtin û felsefa jiyânê. Di ola Zerdeşt de, agir siya Xwedê bû. Berdewambûna jiyân û sembolê zanîne bû. Agir nîşana zanabûn û pêşketinê bû. Têkoşîn û serketin bû.

Her çiqas îro di ser ola Zerdeşt de hezar sal derbas bibin jî û piştî wê Kurd gelek olên din qebûl kiribin jî, dîsa jî şopên ola Zerdest li ser olên nû tesîra xwe hiştiye û dihêle. Ev tesîr û şop îro jî di nav Kurdên xiristiyan, êzdî û misilman de bi awayekî vekirî diyar e. Her wiha di nav Kurdên sûnî û şîî de jî wiha ye. Bi kurta-hî îro jî agir di nav hemû Kurdan de pîroz e.

Felsefa agir ji hezar salan ve ye ku di nav Kurdan de bingeh girtiye. Belav bûye. Bûye kultureke dîrokî. Bûye edebiyat û felsefe. Di nav Kurdan de, li ser agir bi sedan gotinên pêşiyên, biwêj, wêje, dua û nifir û hwd. hene. Ji wan çendên ku niha tên bira min wiha ne:

**Gotinên pêşiyên:**  
- Tu bibî agir dê incax bikaribî çend qevd pûşê der-dora xwe bişewitîn!

- Agir berda kayê û xwe da aliyê bayê: Yanî ew bi xwe dike, lê xwedî lê dernakeve.
- Agir bi erdê dikeve hişk û ter bi hevdu re dişewitin.
- Cihê ku ar lê tûne be, dûxan lê ranabe!
- Agir bi ser serê min ketiye, tu firikê xwe diqelînî!
- Dinya bisekine av û agir nasekine!
- Agir û pîso li cem hevdu nabin!
- Agirê xweş agirê qurman e.

**Biwêj:**  
- Agir deyn kirin: Ji bo ew kesên ku eceleya wan hebe. "Ma tu hatî agir deyn bikî lo!"

- Agirpêketî: Ji bo ew kesên ku çav li der bin. Seksî bin tê gotin. "Ew agirpêketî ye."

- Agir ji dev barin: 1) Ji bo ew kesên ku gelekî birçî dibin tê gotin. 2) Ji bo ew kesên ku zêde gotin û çêran jî xelkê re jî dikin tê gotin.

**Dua:**  
- Bi av û agir şuştin: Ji bo ew kesên herî pak û temîz tê gotin. "Tu bi av û agir bêyî şuştin."

**Nifir:**  
- Agir bi pot û çotên te bikeve, agirê kulê bi canê te bikeve an jî agir bi laşê te bikeve.  
- Agir li ser te bibare!  
- Agir bi teriyê ketin: Ev zêde ji bo ew kesên ku pîrr derewan dikin, tê gotin.

Kurd jî ber ku zêde ji agir hez dikin, carnan agir wekî çekê jî li hember dijminên xwe bi kar tinin. Agir berdîdî mal û warên dijminên xwe. Ew dixwazin bila agir pisitî û genîtiya dijmin pak bike. Yanî bila ew bi av û agir bîn şuştin. Vî karê han jî, bi pirranî di demsalên havîn û payîzan de dikin. Agir diavêjin û xwe di-din aliyê bayê. Zivistan û biharan jî xwe ditelînin û deng ji wan nayê.

# Di civîna li ser alfabeya Kurdî de: Pêşniyara guhertina alfabeyê

Mehmet Gemsîz

Di civîna ku mijara wê li ser gelemşeyên alfabeya Kurdî ya Latîni bû de, ramana guherandina alfabeyê xwe da der. Axivkarên ku li ser gelemşeyên alfabeyên nêrînen xwe anîn ziman bi tenê guherîna tîpên 'î û î' yê bi 'i û i' yê diyar kirin.

Nêrîna zêdekirin, kêmkirina tîpan an jî bêhtirkirina diftong (pevdeng, cotdeng) an wek jî bo tîpên ç, p, t, k aligir nedît.

Civîna yekemîn a li ser gelemşeyên alfabeya Kurdî ya Latîni bi pêşengiya Enstîtuya Kurdî ya li Stenbolê di 31'ê Tîrmeha 1993'yan de li Navenda Çanda Mezopotamya li bajarê Stenbolê, li Taksîme saet di 11. 00'an de çêbû.

Serokê Komîteya Kargêr a Enstîtuya Kurdî ya li Stenbolê Şefîk Beyaz, civînê bi axivîneke kurt û têrkar vekir û li ser gengêşiyên di warê alfabeyê de rawestiya. Beyaz, daxuyand ku ji bo nêrînen Enstîtuyên Kurdî ya Parîs a Brukselê, Reşo Zilan, M. Alî, rojnameya Armanc, kovara Nûdem hîn bibin ji wan re xeber hatiye sandin bes tenê bersiva Firat Cewerî ku berpirsiyarê kovara Nûdem e ketiye destê wan.

Pisî Şefîk Beyaz, Felat Dilges mafê gotinê stand û bi kurtî li ser amadekirina dîroka alfabeya Latîni ya Kurdî rawestiya û diyar kir ku Celadet Bedirxan, heta pê qediyaye alfabeya xwe nêzi-

kî ya Tirkî kiriye, ji îşaret, niqte û diftongan xwe dîr xistiye û bi wan emel nekiriye. Dilges pist re ji bo hêsanbûn û perwerdehiyê guherîna tîpên 'î û î' yê wek ên Tirkî 'i û i' yê xwest.

Nivîskar Osman Aytar di peyvîna xwe de balê kişand ser terciha îşaretan û wî jî guherîna tîpên 'î û î' yê diyar kir. Zimanzan Torî, bêhtir li ser fonetîkê rawestiya û li hember guherîna tîpan derket. Torî tîrsa xwe bi cihêrengbûna tîpa 'î' ya Kurdî û Tirkî anî ziman, guherîne wek talûkeyekê nîrxand û ji aliyê îşaretbûnê ve wekhevkirina wan windabûna 'î' ya Kurdî şîrove kir.

Zana Farqînî bala besdara kişand ser pêleyîstina alfabeya Latîni ya Kurdî ku tê de guherîn çêbûne, tîpên 'î' bi 'i' yê, 'î' bi 'i' yê, 'x' bi 'ğ' yê, 'ê' bi 'e' yê û 'w' bi 'v' yê guherandine heta tîpa 'k' û 'q' bi pêşniyariya Elî Seyda Gewranî ji aliyê Celadet Bedirxan ve pisî hejmara Hawarê ya 24'an wek îro hatiye bi kar anîn. Farqînî jî guherîna tîpên 'î û î' xwest û sebeb jî bi derfetên teknîkî wek klaviye, kompîtur û pêdiviyên Kurd û Tirkan ên bi hev re girê da.

Berpirsiyarê Gistî yê Nûbiharê Sabah Kara hilanîna tîpa 'î' xwest û sebeb jî bi tunebûna 'i' yê di alfabeya Kurdî ya Erebi de girê da. Her wiha Kara îşaretkirina tîpên 'ç', 's' û 'ê' jî wek alfabeyên Latîni ên slavîk 'ç',

'ş' û 'é' yê xwest.


Zimanzan Feqe Huseyn Sağniç, jixwe ew di alfabeya xwe de tîpên 'î û î' wek 'i' û 'i' ya Tirkî bi kar tîne. Feqe Huseyn sebebê ku Celadet Bedirxan di alfabeya xwe de tîpa 'î' bi niqte û 'î' yê jî bi kumik nîşan kiriye bi klavyeya Fransîz ve girê da û da kifşkirin ku derfetê wê hengê ew dane zorê ku bi vî rengî alfabeya xwe amade bike.

Ji rojnameya Azadî Latîf Epözdemîr ku ew jî tîpên 'î û î' yê wek a Tirkî dinivîsin daxwaza hêsankirina alfabeyê diyar kir.

Civîn li ser taloqkirina 21'ê Tebaxê dawî lê hat. Daxwaza besdariyeke fireh jî hat diyar kirin û hat xwestin ku hemû der û dorên Kurd ên çandî jî vê hayîdar bin, ew jî nêrînen xwe der heqê vê rewşê de bibêjin û alfabeyeke yekgirtî derkeve holê û bê bikaranîn.

Ji aliyê din ve de civîn li ser rastnivîs û rêzimana Kurdî jî di demên pêşiya me de çêbibin pisî ku gelemşeyên alfabeyê hel bibin.

Kesên ku besdarî civîna li ser gelemse û problemên alfabeya Latîni ya Kurdî bûbûn ev in: Zimanzan Feqe Huseyn Sağniç, zimanzan Torî, ji Medya Günesî Felat Dilges û Osman Aytar, ji rojnameya Welat Zana Farqînî, Berpirsiyarê Gistî yê Kovara Nûbiharê ya îslamî Sabah Kara û Süleyman Cevîk, ji rojnameya Azadî Latîf Epözdemîr û Mele Mecit.



Di wêneyê de, besdarên civîna li ser alfabeya Kurdî tîne dîtin.



## Wênesazê 'Derbirîna rengan': Gohdar Selahedîn

*Ji kerema xwe re hûn dikarin xwe bidin naskirin?*

– Navê min Gohdar Selahedîn e. Di sala 1967 de li bajarê Dihok, Kurdistanê Başûr hatime dinê. Di sala 1987'an de min Enstîtuya Hunerên Ciwan li Bexda beşê grafîk bi dûmahîk anîye. Di sala 1987 de min pêşangeheke ezmanî (tecrîbî) li Bexda vekir. Di sala 1989-1990 di bîranîna roja Helebceya şehîd min pêşangeh vekir. Wekî diyar e piştî serhildana pîroz û piştî danîna hikûmet û parlamentoya Kurdistanî, em çend heval û hunermendek şandin Enstîtuya Hunerên Ciwan li Dihok ku damezirîn. Bi vê helkefitina mêjûyî min pêşangehek taybetî, li Hela Şehîd Selman, ku sembola yekîtiya hunermendên Kurdistanê ye vekir û pêşkêşî xelkê Kurdistanê kir bi navê "Derbirîna Rengan".

*We çawa dest bi vî karî kir?*

– Ez dibêjim huner wekî karekî mekanişkî nîn e, mirov dest pê bi ke, yan dest jê berde. Lê hunermend wekî mirovekî hestdartin e ji mirovên din. Di sala 1982'an de min dest bi karê hunerî kirî ye û di sala 1982-1983'an çûme Enstîtuya Hunerên Ciwan li Silêmanî, du salan min li wir xwendîye, paşê ji bo pisporiyê çûm Enstîtuya Bexda û min grafîk xwend. Ji sala 1982'an heya 1992'an bêhtir ji 9 pişikdariyên min hene, wekî pêşangehên bi komel û festîvalên hunerî li Dihok, Hewlêr, Silêmanî, Bexda û Almanya.

*Ji wênevan û kevalkerên dinê hûn kê dinasin, êdî zehf hûn kê dicibînin?*

– Bi rastî wênevanên dinê gelek in û kevalên wan jî gelek min dîtine di kovar û berkên hatine çapkirin de, li derve. Bi rastî şolê wan gelek maye sax, her çiqas ew bi xwe miribin jî. Ew hunermendên rastbêj di dilê gelan de dijîn û mane sax.

Hunermendên bi gelê xwe re ne jiyane û nebûne hevparên pirsgrêkên gelê xwe her çiqas jîrek bûne jî ew di dilê gelê xwe de ne jiyane û wek hunermend nayên qebûlîkirin. Ji huner-

mendên ku ez hez dikim: Hunermendê Espanî 'Francisco de Goya' û yê Holandî 'Vincent van Gogh', Hunermend Şagal û Picasso.

*Hunermendî, li gor we çî ye, rola hunermendê Kurd divê çî be?*

– Berî hemû tiştî hunermend mirov e... 'lîtîzam e', helwest e, ciwanî ye...

Pêdivî ye hunermendên Kurd ên xudanbîr nêzîkî xelkê xwe be, wekî neynîkê be ji bo pêşerojê. Divê rolê hunermendê Kurd avakirina binyateke hunerî û şewekarî be. Divê ku li navbera her çar parçeyên Kurdistanê pêwendî bîne girêdan, ji bo ku nêzîkbûna hunerî û nîşana cîhanê bidin vî şaristaniya Kurdistanê.

*Li Kurdistanê Başûr wêne û keval bala gel çiqas dikişînin?*

– Li Kurdistanê Başûr gel nêzîkî hunerê û huneriyê wekî karekî şaristanî dizanî. Lê li Kurdistanê Başûr rexnegirê hunerê kê in.

*Hûn êdî zehf li ser çî mijara babetên kevala çêdikin?*

– Pisporiya min "grafîk" e. Lê niha li Kurdistanê Başûr amûrên grafîk, bi dest nakevin. Lewre ez bi pastêl û boyaxên avî û pêdiviyên dîtir şûl dikim. Di sala 1992'an de min pêşangehek vekir bi navê "Derbirîna rengan". Çunkî reng xwedî rolekî sereke bûn di gel xîçan û xîçik jî bi reng bûn.

*Ji xeynî wêne û kevalan hûn çî karî dikin? Kîjan babet bala we dikişîne?*

– Piştî danana (avabûna) parlamento û hikûmeta Kurdistanî em çend hevalên hunermend şiyandin (şand) Enstîtuya Hunerên Ciwan ku li Dihok vekin û niha ez li wê derê mamosteyê xîçkêşanê me. Karê me jî bo xwendekarên Kurd bi awayekî zanistî, fêrkirina kêşana wêneyan e.

*Kurdistanêke serbixwe ya ku hemû parçeyên Kurdistanê di hundirine wê bê avakirin an na?*

– Belê béguman wê bê avakirin û emê bi serbilindî û pîr azad tê de bijîn. Ev diyar e.

**Hevpeyvîn: Mazhar Günbat**

## Ji Fahad Gardawan sê helbestên Soranî

### GERANEWE

Le kenarî rûwbarî  
Rûhda  
Be çîwardewreyî xomda  
Desiwrêmwewe  
Be haşqî û dûr le şarekem  
Alayî xwênî dîm  
Berzkird ûtewe  
Ca reng le karzêyî ew şîneda  
Serqatî dîm  
Be desteyî to zîndûbêtewe  
Zîndawarî jîyan  
Biheşêtewe  
Dayî paşê... ba sermayê nebê  
Reng e emîş le xurbetda  
Carekîtir bigerêtewe  
Bigerêtewe...

Stockholm-1993

### PÊŞMERGE

Eger pêşmerge wilatkem  
Lem oqyanûsî mergesateda  
Be xwênî geşî  
Nexeseyî Kurdistan im ba bikêşî  
Ewa şîhîra kanim  
Dekem be hîmoglobînî  
Girî ew xwên e geş pakane

Carêkîtir  
Bo pêşmerge  
Wekû qeqnes demwitêm û  
Wekû helo beser çiyakan  
Le şeqeyî bal dedem û  
Berz defirim.

Macarîstan-1981

### DESTANÎ DILDARÎ

Azîzekem  
Çewerwanî reng e dirêjtîrbêt  
Dilgîr mebe  
Le bêlenekanim peşimanîm  
Çawerwan be.  
Newrozekeyî emcareman  
Le ciyatî maç  
Rûberek xwên bû  
Cêgayî jûanî  
Gorîstan û serqebzan bû  
Mindalaneyî şarî şîrîn  
Le ciyatî niwqî û şîmatî  
Gazî jehrewî bû  
Be diyarî  
Le nêw xan û  
Le nêw sewzalf  
Le kenarî rûbar û şar  
Laşeyî mirov  
Bû be xorakî xak

Ew ewaneyî  
Dildarîm dekiwîjîn  
Ew emaneyî  
Le maçî hengiwîni şîrîn  
Bê beşîm dekem  
Beynayî zû  
Bargem dexeme serşan im  
Şax be şax  
Dol be dol  
Rêga debirim  
Ta tolayî  
Mindalekan û pîr û genc  
Nesên mewe  
Encare nagerêmwewe nagerêmwewe

Diwênê giwtiyan  
Newroz e, xak pêdekenê  
Diwênê giwtiyan  
Newroz, wek gul ciwanî denwênê  
Gotim rol e  
Newrozî emsal  
Heg beyî xemî  
Giwte mêxekî reşa  
Çawî Newroz  
Pîr firmêsk e  
Newroz, emsal reşpoş e  
Rû le wilatî min.... naka û  
derwa  
derwa  
Wekû haspî Mame Yare  
Rû le şaş û dol deka  
derwa  
Wekû "Bêcan"

Rû le ciya û deşt deka  
derwa

Wekû "dêwane"  
Ser herdigerê û  
Awayê cê dehête  
Şar be dere û agir le  
Çawanî debarê  
Gotiyan Newroz  
Dengî nizm e  
Qiwirgî pîr le giryan e  
Ke mîwanî bûm  
Serî korpeyî sawayî  
Xistibûwe ser ranî  
Platoyî ser şanî  
Xistibûwe ser laşeyî daykî  
korpeyî sawa..

Bawk le daxa  
Hawarî dekird  
– Şarezûr dekeyîne parçe  
agrêk  
Pêşkeşî  
Ajdahakî sedeyî bîstem  
dekeyîn  
– Helebce dekeyîne  
gulêk  
Le singeyî "Goran" î  
Mezin dedeyîn,  
Dujmin şar bederken

Bonn/Almanya-1988

Ev hersê helbest ji pirtûka Fahad Gardawan a bi navê Destaneyî Mêjû hatine girtin.

### Ferhengok

**Bêcan:** Nasnameya pêşmerge şehîd Heyder Kerîm bû.  
**Dewanê:** Mebest Şaîr Goran e.  
**Berz:** Bilind  
**Minal:** Zarok  
**Minalanîş:** Zarokan jî  
**Şax:** Çiya  
**Dol:** Gelfî, vadi  
**Fermisk:** Hêstir an jî rondikên çavan  
**Ran:** Hêt, çong  
**Rûbar:** Çem  
**Bal:** Bilindfirîn  
**Emîş:** Ê me jî  
**Bawk le dax e:** Bav li ber daxdan û êşkencê ye.  
**Emcarê:** Vê carê

# Ezmanê sahî baranê nabarîne

## Memoyê Dekşûrî

**OKRAYNA, XARKOV-** Ji bîrkirina serpehat, bûyer û rûdanên dîrokî di hiş mirovên îroyîn de problemeke nûjen e û derdekî bêderman e. Çimkî ev dibe sedemê ne bihev-girêdana xelekên zincîra dî-rokê û veqetandina rabûrdû ji Nihokê ve behêvbûn û bêba-werbûnê bi paşerojê ve. Di vir de mirov di nêrînên xwe yên kesani de teng dibe û di oda hişê xwe yê ne fireh de xwe dide girtin. Ji ber çî, me ev kes xiste bin mikroskoba xwe ya zanistî û nêrîna çavên rex-negirî, ji ber ku bi rastî di dema nûjen de hem ji aliyê dij-minên dagirker yên dij zanistiyê ve û hem jî, ji hêla ceqel û nandozên civaka me ve, ev mesele xweş tê meşandin û dixwazin vê xwarina jehrî bi gelê me bidine pejirandin. Gelo çima û sînorên wê yan jî koka wê ji kîjan kûranyê derdikeve? Berî hemû tiştî, civaka me weke laşekî saxlem û canekî bedew û hişmend di dirêjahiya hebûna xwe de ji vî tiştî bê par maye û endamên wê yên cur be cur bela wela bûne. Ew têkiliyên resenî di nav parçeyên xwe yên bingehîn de bi wir de kiriye. ev jî dibê sedema pêşketina ne bi hev re û bêpîvan, çiqas di nav xwe de ewqas li hember derveyên barbar û hov.

Jihevexistin û dabêşkirina civaka me bo parçeyên biçûk tim û tim peydabûna nexweşiyên bêcare û ava jiyana me roj bi roj dimiçiqîne, diçikîne û di dawiyê de ev dibe eger û mercên xurt ji bo neberxwedana wî û jorbûna hêzên wî yên sênî ku bikaribe xwe biparêze û xwe nûjen bike.

Çi li seviya çanda madî û çî ya hiş û birî parçebûn û jihev-durxistin cihekî bilind girtiye û xwe danaxe.

Xaka welatê me bûye çend qet li hevdu hatiye beşkirin lê ji me re qedere hatiye qebûlkirinê.

Birakujiya olperestî û hev-kustîna êzîdî, fileh û misilman û di mejî û hişê me de cihê xwe girtiye û ji me re nebûye warek.

Cavsoyîya di navbera gelê me de ji ber cudabûnên zimanî, nistecihi û folklorî tim zêde bûye lê me di ber guhê xwe re berdaye û me bi cavekî rast lê temase nekiriye.

Me baş bala xwe nekisandiyê ser gurrkirina serê hevku-



Îro, li Kurdistanê, tevgera gerîla bûye garantiya parastina mafê jiyane ji bo gelê Kurd. Bê hebûna gerîla eşkere ye ku wê jiyana kolefî para gelê Kurd bikeve.

tinê ku di navbera gelê me de ji ber sedemên herêmî û ji bo pêkenîna daxwazên navçegirî û herêmpereştî.

Nepejirandina hevkarî ji bo pêşketina meseleya milî û peydekirina bîrdoza neteweyî bûye sebebê çar parçemayîna welatê me di destê dagirkeran de.

Belê hevalo, îro li cem me Kurdan nêrînên seyr û ecêb peyda bûne. Em dikarin çend ji wan nimûneyan pêşniyarî we bikin.

- Carenûsa gelê Kurd divê bê çareserkirin di rîya dîplomasiyê de û karê siyasî de.

- Gelê me divê ji bo zimanê xwe bixebite û ziman di pêşiya hemû tiştan de ye.

- Mesela me girêdayê bi dewletên dagirker ve, otonomî yan jî kulturparêzî çareya me ye.

- Ser tu siûdan li me nake û gelê me ber bi qetlîama mezin ve disîne.

Katê em temase li van xalên jorimandî bikin pêwîst e û naçar e tiştekî rast û dirust bidine xuyakirin.

Gelo ma wextê em dixwazin carenûsa xwe bi destê xwe bixêzin çî li gora bawernamêyên navneteweyî be yan jî, li gora daxwazên gelê me divê em xwe bi malbata bajarvaniya serdemî re bimesînin û bi-

bin xwedî sînor. xak, al û cihekî bi rûmet di cihanê de. Heger armanc ev be û ne wek dilên nandoz û dijminperestan em xwe amadeyî şerê xwe yê rizgariyê bikin û li ser hemû eniyên xwe diyar bikin, emê bi ser kevin.

Heger dijmin û dagirkerên welatê me xwe bêartêş kirin û kişandin ji welatê me hengê

**Ev bahoza demokrasiyê ne ji bo hênîkbûnê ye lê ji bo şikandina darê ye û ziwakirina erdê ye. Dû bêyî agir nabe û baran jî bê ewrên reş nabe. Laşê me îro ber bi hevdu ve tê û parçe û endamên xwe li ser hev kom dîke ji ber vî jî rengê nû werdigire û naverok serdem dihewîne. Em îro bi zimanê xwe dilivîn û bi mejiyê xwe diramin û bi dilê pak û xwîna sor xwe nû dikin.**

em jî dibin tewandarê çêkirina artêsekê, yan jî dewletê bêartêş li dinyayê hene, heger hebin gelo ma wê di nav Roj-

hilata Navîn de bin, mêze bikin li welatên dagirker, dîplomasiya we bi devê tanqan dipeyive û narincên kîmyawî tî livandin. Erê ma kanî siyaseta bêartêş ta wan dewletên xwedî dîrokeke dirêj ên ji demokrasîya bînimûne. Siyaset û artêş bêyî hevdu nabin ji ber ku tiştekî dûrî aqilê ye.

Tenê dema tîvinga we li pişt we be, hûn dikarin siyasetê bimesînin, îro gerîlayên me hem gelê me diparêzin, hem jî siyasetê birê ve dibin.

Pêşxistina armancekî li pêşiya yekê din divê neyê xwarkirin, Katê em dibêjin em îro miletek in û civata me bi ser û binî ye, em xwedî-xwazên hemû mafên jiyane yên civakî ne, divê ev nebe listik û em nebîne benîştê cûtîne di devên dijminan û xêrnexwazan de. Mafê kulturî, azadiya gotinê, dewletçêkirinê ji me re heqêkî heq e û destdirêjahî li ser vê nabe. Xuya ye ku ev li xweşiya hin kesên me yên rih-kole nayê û dixwazin bilîzin li ser millet bi guherandina armancên tevgera xwe. Ev guherandin rengê xwe ji mirovketinê û bînetewbûnê distîne. Çimkî katê em millet bin yek mafekî me heye: weke mafê hemû gelan carenîvîs tê wateya serxwebûnê û afirandina welatekî xwe di gerdûnê de.

Di roja îro de ev konevaniya nokerî li welatê me ji nû ve tê nûkirin û çend kesên berjewendperest hene ku dixwazin gelê me ji niştimana wî rakin û dinamîzmên hundurîn yên şoreşa me ya bajarvaniyê înkâr bikin û bi vî awayî berhem û tenîştberhemên ku hatine standin bi rijandina xwîna hezaran pêşmergeyên welatê me, xebata me ya rûmetê hiç û pûç bikin, her tiştî dikin.

De werin em xelekên dîroka xwe pêve kin û pêşeroj û paşeroja xwe bidine ber hev.

Tişt û pêşketinên îro berhe-ma çandina dendika dara serxwebûnê û azadiyê ya avolayî bi xwîna şehîdan e.

Ev bahoza demokrasiyê ne ji bo hênîkbûnê ye lê ji bo şikandina darê ye û ziwakirina erdê ye. Dû bêyî agir nabe û baran jî bê ewrên reş nabe. Laşê me îro ber bi hevdu ve tê û parçe û endamên xwe li ser hev kom dîke ji ber vî jî rengê nû werdigire û naverok serdem dihewîne. Em îro bi zimanê xwe dilivîn û bi mejiyê xwe diramin û bi dilê pak û xwîna sor xwe nû dikin.

Normên nû ji me re divên. Îro em xwediyê gemiya jiyane ne ku di avê de teqle li xwe didê û li hember pêlên hov xwe radigire û rîya xwe naguherîne.

# Ez Kurdistan im



Kurdistan im ez buhişt im  
Bê horî û bê firîşt im  
Ne bi kewser ne bi zimzim  
Bi xwîna sor tême şuştin

Kurdistan im xweş bibîn im  
Gula sor rîhana şîn im  
Bêhn didim gelên cîhanê  
Wan li dora xwe dicivînim

Kurdistan im bendî war im  
Ji Kurdan re namûs û ar im  
Tim hêviya gelên bindest  
Ji dijmin re pêt û ar im

Kurdistan im ez evîn im  
Ji gelan re tim hêlîn im  
Ji bo hevkar û nokeran  
Agirê har im birivîn im

Kurdistan im ez bi deng im  
Şîrîn im pîrr şox û şeng im  
Teq û req e ser serê min  
Her dem bi şer û bi ceng im

Kurdistan im bi xêr û bêr im  
Meskenê piling û şêr im  
Bi maden û bi cewher im  
Dara bitam im ne sêr im

Kurdistan im bi hewr û rez im  
Dar û ber im rêz bi rêz im  
Fêkiyê min tewre tewre  
Bi hatinî pîrr bi hêz im

Kurdistan im xweş û geş im  
Li destê dijminê reş im  
Êdî va ye hêdî hêdî  
Ber bi azadî dimeşim

Kurdistan im gelek rind im  
Bi bajar û meyr û gund im  
Çol û berî deşt û zozan  
Bi keke bircê bilind im

Kurdistan im cih û war im  
Bi bax û baxçe û dar im  
Jiyanek nû bela dikim  
Bi çem û kehnî û rûbar im

Kurdistan im ez rûmet im  
Him namûs im him rûmet im  
Giranbuha û hêja me  
Gelek bi qedr û qîmet im

Kurdistan im ez zengîn im  
Çar hawîrdor dixemilînim  
Bi rengê kesk û sor û zer  
Ez xwediyê ala rengîn im

Kurdistan im gula sor im  
Xeml û xêza hawîrdor im  
Ketime destê neyaran  
Bê av mame zû diborim

Kurdistan im ez mirad im  
Xwediyê Dicle û Ferad im  
Gula sor im bê av mame  
Diçilmisim bêhnê nadim

Kurdistan im pîrr delal im  
Reng şîn wek ava zelal im  
Gelekî bi nan û xwê me  
Ne nankor im şîrhelal im

Kurdistan im li ber bext im  
Bi çek û sîleh û rext im  
Xeml û xêza xwe danînim  
Wek xatûna li ser text im

Kurdistan im bi hebûn im  
Bi hesreta sexwebûn im  
Wekî bûka dest bi hinne  
Ji nû ve porê dihûnim

Kurdistan im ez bêhal im  
Birîndar im bê mecal im  
Bi hawar û gili'w gazin  
Ji kezebê de dinalim

Kurdistan im bê miraz im  
Ji bo azadî digazim  
Bes e evqas zilm û talan  
Ez jî serxwebûn dixwazim

Kurdistan im li Rojhilat im  
Li ser xelasi'w felat im  
Çiya'w zozan mêrg û kanî  
Çol û deşt im lat bi lat im

Kurdistan im li Rojav im  
Bi gol û çem û delav im  
Bi newal û bi nezar im  
Ber bi roj im ber bi tav im

Kurdistan im li Başûr im  
Ber bi çav im pîrr mişûr im  
Ji ber ku ez tim bindest im  
Her dem li bin siya şûr im

Kurdistan im li Bakur im  
Ez dayîk im bi keç û kur im  
Wan xwe daye bin çengê min  
Ez jî bi wan re difirim

Kurdistan im roj û hîv im  
Bi kembera zêr û zîv im  
Geh'li jêr im geh li jor im  
Erd û ezman tev dipîvim

Kurdistan im ber bi xêr im  
Bi şûr û xencer û kêr im  
Nêzik bûye serfirazî  
Meh û rojan dihejmêrim

Kurdistan im ez bihar im  
Bi fêkî û sêf û dar im  
Wek kulîlka zîv û zêr im  
Tim li ber pozê neyar im

Kurdistan im ez havîn im  
Bi agir û bi rivîn im  
Dilê dijmin dibirêjim  
Ji Kurdan re ez evîn im

Kurdistan im ez payîz im  
Pîrr ciwan im hîna qîz im  
Bûm dildarê xortên çeleng  
Bi kêf û eşq bi wan re dilîzim

Kurdistan im ez jiyan im  
Şewq didim roka cîhan im  
Di Rojhilata Navîn de  
Ji Kurda re rih û can im

Kurdistan im bi bistan im  
Bej û avî'w daristan im  
Ez ew xaka Mediya me  
Tim dergûşa şaristan im

Adar Jiyan

# AZADÎ



Abdurrahman Durre

## Dîndar û dînxwar

Çar birayên dîndar; yekê rast, sisêyên sextekar. Bi salan bi hev re kar dikin, bi hev û din re dimeşin, dibezin, dikevin, radibin. Hersê birayên sextekar û dînxwar, birayê xwe yê dirust û dîndar, tim û tim dixapînin. Jê re dibêjin: "Em birayên hev ê dîn in". Milk û mal, serwet û dewlet, text û tac, talan û bac, xulase hemû tişt ji xwe re digirin û tu tiştî nadin birayê rast û dîndar, hemû kar û barên xwe jî bi wî didin kirin.

Sal û zeman bi ser ve diçin, dinya diguhere, zarokên birayê dirust û dîndar mezin dibin, dixwînin, bi fêh û hiş dibin. Bala xwe didinê ku, bav û kalên wan bi salan hatinê xapandinê, wilo dixwazin ku wan jî bixapînin. Ji wan re jî dibêjin: "Em

**Zarokên hişyar û şarezaya dibêjin: : "Qaşo em bira bûn! Qey biratî wiha ye. Ev karê ku hûn dikin, karê guran e, karê hovan e, ne yê insan û mirovan e. Êdî bi virr û derewan nema hûn me bixapînin. Divê hemû mafên me yê insanî û demokrasiyê binasin û bibînin. Dû re bêjin, em birayê hev ê dîn in".**

birayên hev in, dîne me yek e, divê herwekî ji bav û kalan ve maye, em serok û axa bin, mîr û paşa bin; hûn jî tim kole û geda bin, di bin destê me de bin. Em xwediyê serwet û dewletê bin, bi text û tac bin, hûn jî weke bav û kalên xwe, bê dewlet, bê rûmet û bê rewac bin". Zarokên birayê dirust û dîndar dibêjin: "Ma qey biratî û dîndarî wiha ye? Madem em birayên hev in, divê em weke hev bin. Em jî bibin xwedî dewlet, em jî weke we azad bin, dîsa jî ji hev re bira bin". Dema ku wilo dibêjin, birayên sextekar, dibin weke gurên har, hovên barbar, cenawerên xwînxwar û êrîş dibin bi ser zarokên birayê dirust û dîndar ve. Li wan dibin dijmin û neyar.

Zarokên hişyar û şarezaya dibêjin: : "Qaşo em bira bûn! Qey biratî wiha ye. Ev karê ku hûn dikin, karê guran e, karê hovan e, ne yê insan û mirovan e. Êdî bi virr û derewan nema hûn me bixapînin. Divê hemû mafên me yê insanî û demokrasiyê binasin û bibînin. Dû re bêjin, em birayê hev ê dîn in".

Birayên sextekar û barbar, dema ku vê rastiyê ji wan dibihîzin, dîn û har dibin, bi hemû barbarî û hovîtiyan êrîş dibin bi ser birayên heqdar û dîndar ve. Dibêjin: "Hûn eşqiya ne, hûn Ermenî ne, ne bira ne, tu mafên we tune ne, hûn hêsir bindest û koleyên me ne...." Û de nava wan de şer dest pê dike. Virr û sextekarî eşkere dibin û dertên meydanê. Gur, hirç û cenawer dibin yek û êrîş dibin ser şêr û pilingên şoreşger. Şer bi vî awayî dest pê dike û didome. Weke her carî, dê dawiyê heq çihê xwe bibîne.

Bijî birayên heqdar, bimirin birayên virrek û sextekar.

# Doh, îro û sibe...

● *Divê mirov rast û bi bingehî nêzikî tiştan bibe, tenê yek alî, serrû û çewt nêzik nebe weke hinekan. Heger mirov birînan nas neke mirov nikare derman jî bike û bigihîje encaman. Gava mirov li destpêka rabûna serokatiya şerê PKK'ê yê rizgariya neteweyî dimezîne, tê dîtin ku, serokatî beriya birêketinê, beriya bangkirinê bi giranî, bi xurtahî li ser dîrokê sekiniye, nirxandiye sedem û encam derxistiye holê.*

## Mizgîn Sîpan

Di zeman de sê beş hene doh, îro û sibehê... Jiyana mirovan ji van her sê parçeyê zeman çêdibe û didome... Ango ji van parçeyan yek bi serê xwe ne tiştê e. Kesê ku doh nas neke, nizanibe; îro jî nas nake, fêm nake û kesê ku îro nas neke, fêm neke, sibehê jî nizanê, fêm nake û nikare li ser piyên xwe bisekine, bi hêza xwe bimeşe...

Dîroknaskirin ji bo tevahiya mirovan girîng e, pêwist e; lê hema ji bo mirovên Kurd bêhtir girîng û pêwist e; gerek e kesên Kurd dîroka xwe bi kûrahî, firehî baş nas bike û fêm bike. Lewre her car dijminên me yên kedxwar- mêtîngexkar û koledar; ji bo ku me ji mirovahiyê, kesbûniyê, zanebûniyê û serbilindiyê dûr bixin; çi kirine? Me bêdîrok, bêdoh û wekî giya bêrih hiştine, ziman, nav û deng, di-

rok qedexê kirine, em ji hebûnê derxistine... Wekî ku tê zanîn jî, dijminan heya demeke pirr dirêj ev xwestekên xwe pêk anîbûn û gihîştibûn encaman...

Ez ne bawer im ku, kesek ji me bibêje beriya şerê rizgariya neteweyî jî min bi dîrokê zanibû û li gor dîrokê dimeşiyam. Belkî hinekan demek berê, dîroka Mezopotamya, Merwanî û hwd. ezber kiribûn û li qonaxan rûdiniştin bi rojan, bi saetan zimandirêjîyê dikirin, li ser dipeyvîn û xwe bi mirovan didan pejirandin jî. Lê hema dîrok naskirin ne hêsan e, duristî, qehremantî dixwaze, jixwe îro karvanî, encam û rûyê wan kesên ku şaş nêzikî dîrokê dibûn li holê ye, xuya ye...

Divê mirov rast û bi bingehî nêzikî tiştan bibe, tenê yek alî, serrû û çewt nêzik nebe weke hinekan. Heger mirov birînan nas neke mirov nikare derman jî bike û

bigihîje encaman. Gava mirov li destpêka rabûna serokatiya şerê PKK'ê yê rizgariya neteweyî dimezîne, tê dîtin ku, serokatî beriya birêketinê, beriya bangkirinê bi giranî, bi xurtahî li ser dîrokê sekiniye, nirxandiye sedem û encam derxistiye holê rexne kiriye, aliyên baş girtiye, hîlbijartiye û parastiye, aliyê ne baş, qirêj û gemar jî avêtîye û li ser bingeha guhertin, ronîkirina dîrokî bi rê ketiye û ew biryar, peyman îro gelê me gihîştandiye vê merheleya serhevraz.

Belê, yê ku bi rastî, dirustî dîrok fêm bike wê nesekine. Wê derman jî bike, bi gul, sosin, berfîn û nêrgizan bixemilîne. Wê şevtariyan bi hîv û stêrk bike; wê dilîtî û stûxwariyê tune bike, rûkenî, dilgeşî û serbilindiyê bîne cihê wî, jiyana nû biafirîne, rewşê bide deşt, bajar, zozan û çiyayan...

Di dîroka me de, çawa ku îxanet, bindestî û stûxwarî heye, mazlûmî heye, wisa paqijî jî heye. Ji ber ku, me tu zilm li kesî nekiriye, me mal û axa kesî talan nekiriye, me durûtî nekiriye. Me dilê gelan, mirovan neşandiye, me stûyê kesî xwar nekiriye û me hêlîna kesî xerab-wêran nekiriye... Ji vê hêlê ve wijdanê me bi gîştî rehet e... Dema mirov

tiştêk nirxand gere hem aliyê baş, hem jî yê nebaş bibîne...

Ji ber van giştan em dişa dibêjin; lazim e mirov dîroka xwe ango doha xwe nas bike û bi ceribîn û tecrûbeyên doh nêzî îro bibe, bimeşe, bide meşandin...

Mirovê ku doh nas kir û bi tecrûbe, bi zanatî meşiya; mirovê leheng e. Çawa dîroka xwe û ya mirovahiyê nas kiribe, fêm kiribe, wisa jî dîroka kesbûniya xwe fêm kiriye, kêmasî, nebesî û qel-siya xwe, xetayê xwe dîtiye û bêtirs êrişê wan dike, wan tune dike kevinperestiyê, çewtiyê napejirîne, hildiweşîne û li şûna wî nûjeniyê, rastiyê ava dike, şên dike. Dijminê paşverûtiyê û dostê pêşverûtiyê, şoreşgeriyê ye. Teng nafikire, ramanê wî bi her rengî ne û bêtixûb in (sînor). Dildarê mirovahiyê ye, dildarê gelê xwe, civaka xwe ye. Hozan, helbestvan û evîndarê gel e, jiyane ye. Xwe ji hemû pirsgerêkên koneyanî, civakî, gelêrî û mirovahî berpîrsiyar dibîne, çareser dike. Cangorî ye, fedekar e, pakrewan e. Heya dawiyê bi nirxên gelên xwe dibîne çavên wî tim berbîjor in. Vala namîne, tim di nav karvaniyê de ye. Ji her aliyê ve kesbûna sibehê, kesbûna nû temsil dike. Serbaz, rêxistinkar û

berxwedanvanê jiyane ye. Belê yanî gerek e karibe, di vê pêvajoya pîroz, dijwar, giranbuha û hêşîn de giraniya xwe deyne û çerxên li gor hêza xwe bizivirîne. Gerrek e wekî agirên tarîşevan be, di nav şoreşê û civakê de...

Me di destpêka nivîsa xwe de jî got ku; doh, îro û sibe, bi hev ve girêdayî ne. Jixwe kesê ku ew tiştên li jor me got pêk bîne, ew kes sibe ye, hatiye bi karvanî û meşa xwe... Bi jiyana xwe ronî delal, giranbuha û hêja ye, wekî pêlên bayê çiya ne.

Dem a mirov li jiyana civakî dinêre tê dîtin ku, mirov her tim li benda sibehê bûne, hêvîdar bûne û derd û elemên xwe tim spartine sibehê. Lê hema li hember van nêrîn û nêzîkahiyan tiştên din ên rast jî hatine gotin. Mînak: Sibe êdî îro ye; îro bi du heb sibehan e; sibe zarokê îro ye hwd. Belê yê ku jiyane bi wate, newroz, hêşîn, pîroz û giranbuha dike mirov e, kesbûn e. Ê ku jiyane rûreş, gemar, zengar û sivik jî dike dişa mirov û kesbûn e... Zeman, dem ji xwe dibihure, diherike; wekî, Dicle, Munzur û Firat... Li benda kesê nasekine. Tiştê ku tê xwestin; tiştê girîng ew e ku mirov kevoka zeman ji destê xwe nefirîne, rûmeta wê zanibe. Belê gere mirovê Kurd xwe li gor agirê serxwebûn û azadiyê xurt bike, nû bike, li ser van bingehan bimeşe...

## XAÇEPIRS

### Amadekar: Rasto Zilanî

**Çeperast:** 1-Mihaîl Aleksandrovîç ..... Niviskarekî Rûs e (1905-1984). Bi romanên xwe yên li ser jiyana Kazakan a dema şoreşa Sowyetê tê nasîn. Çend ji pirtûkên wî ev in: *Û Bi Bêdengî Diherikî Don*, *Erdên Şiyarkirî*, *Qedera Mirovahiyê*. Di wêne de tê dîtin/ *Yezdan 2-Li Kurdistanê bajarek/ Lehî, lesar 3-Rengê sor a gulân/ Rêziman 4-Navê rêxistînek ku li hember Îngiltere, ji bo rizgarkirina Îrlanda têdikoşe/ Pejikandin, dapiştin/ Peyveke bi Erebi ku tê wateya 'Dûrî te be' 5-Rih/ Vejen/ Di notayê de dema seknê 6-Wêjevan 7-Fêkiyek trôpîkal 8-Dep, kereste/ Naveke Yewnaniyan 9-Tipên bêdeng yên peyva 'Antî' / Notayek/ Kozere 10-Helbestvanekî Kurd yê navdar. Li gor çavkaniyekê, navê wî yê rast Mela Emer e û di navbera salên 1785-1834'an de jiya ye. Gelek helbestên wî û çirokek wî yê bi navê "Seyfîlmîlûk" gihîştîye vê rojê*

**Serejêr:** 1-Suxte/ Mengiraniya zêr 2-Li dorhêla Mêrdînê navê eşîrek/ Dij 3-Pereyê Bûlgaran/ Cephe 4-Beşek ji nava malê/ Tewr, awa/ Ji Misra qedim navê yezdanek 5-Unîversîte 6-Dîn/ Qezenc, idare 7-Dagerîn/ Bircên keleşan 8-Bi zimanê biyanî kinnivîsina 'birêz'/ Daçekek ku tê pêşiya peyvê / Pal, evraz 9-Stranên dîni 10-Se-

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												

walek bi timtêla deve, li Amerîkaya Başûr dijî 11-Li konsolosxaneyan nûnerên leşkerî 12-Nobedar

### BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ

**Çeperast:** 1-Nazim Hikmet 2-Evin/ Êleg/ Es 3-Pa/ Tav/ Avî 4-Eba/ Fihrist 5-Nûbar/ War/ Îş 6-DNAŞ/ Erd 7-NATO 8-Rom/ Mem 9-Mazûvani 10-În/ Ranîn

**Serejêr:** 1-Nependî/ Mî 2-Avabûn/ Ran 3-Zî/ Abanoz 4-Int/ Amûr 5-Afret/ Va 6-Hêvî/ Roman 7-Îl/ Hwd./ Enî 8-Kesra/ Emîn 9-Mg/ Îr 10-as 11-Tevtî 12-Sî

## QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ..... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiye razînin:**

**Li derve:** Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

**Li Tirkîyê:** 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyeye pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

**Navnîşana Welat:** Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul  
Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

**Mercên abonetiye:**

	Li hundir	Li derve
3 meh	60.000	30 DM
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

# Qencyê bi qencan re bike

Camêrek her roj di ber derê mala paşê re dibuhure û bang dike, "Qencyê bi qencan re bike, xirabiya xiraban jixwe têra wan heye." Paşê ji xulamê xwe pirs kir ka bê ev zilam çi dibêje. Xulam ji paşê re gotin ku çi dibêje. Wezîr gote xulam "Ka libek, zêr bidinê ku here." Xulam anî zêrekî da zilam û ew jî bi rê ket çû. Demek şûn ve bi rê de leqayî yekî kor tê. Zêrê ku paşê dabû wî, xiste destê zilamê kor de û çû. Roja din dîsa diçe ber derê mala wezîr û bi dengekî bilind qîr dike dibêje: "Qencyê bi qencan re bike, xirabiya xiraban jixwe têra wan heye." Wezîr dîsa dibêje xulam zêrekî bidinê ku here. Zilam zêra xwe hildide û dikeve rê. Bi rê de dîsa rastî ewê kor tê û liba zêr a xwe ya din jî, di-de wî. Kor ji zilam re dibêje, "Himin tu vê qencyê bi min dikî, divê ez jî heqê qencya te bidim te. Ji kerema xwe re were em herin mala me şîvê. Her çiqas zilam spasiya xwe bike jî yê kor bela xwe jê venake û dibêje îlleh tê werî. Ew jî radibe bi kor re diçe mala wî şîvê. Yê kor diçe cem jina xwe jê re dibêje, "Avsîreke têrsîr ji me re çêbike, mêvanê me heye."

Dû re koro diçe cem we-



zîr dibêje ew zilamê ku ev du roj in tê ber deriyê mala te tu zêran didiyê, dibêje ku bêhn ji devê wezîr tê. Wezîr dibêje koro, "Zilam, li ber deriyê malê bang dike, ez li hundir im ew çawa bêhna devê min seh dike." Koro dibêje, "Heke tu bawer na-

kî, bang lê bike, bila bê rihê te kur bike, heke li rûyê te nêrî, ez virran dikim." Dizivire tê malê bi zilam re şîvê dixwin.

Roja din, paşa wek gotina koro kir, bang li zilam kir, zilam hat, paşa got rihê min kur bike. Zilam difikire,

"Min sîr xwariye bêhn ji devê min tê ez dê çawa bikim." Dest bi kurkirina rihên paşa dike. Dema paşa rûyê xwe ber bi wî vedigerîne ew ji bo ku, bêhna sîrê neçe paşa, rûyê xwe jê dizivirîne. Li ser vê yekê paşa kaxizekî dinivisîne, dibêje vê ka-

xizê bibe cem nanpêj, ew dê tiştekî bide te. Lê di nav kaxizê de nivisiye ku, dema ev mirov hat, biavêjin tenûrê wî bişewitînin.

Zilam kaxiz di dest de bi rê ve diçe, koro wî dibîne, jê dipirse çi bû? Zilam dibêje, paşa ev kaxiz da min, got bibe cem nanpêj dê tiştekî bide te, koro kaxizê jê distîne, dibêje tu xwe newestîne, bisekine ez bibim, kaxizê hildide û dibe dide nanpêj. Nanpêj kaxizê dixwîne, koro diavêje nav pêtên agir.

Sibe dibe dîsa zilam tê ber deriyê paşa, dibêje, "Qencyê bi qencan re bike, xirabiya xiraban jixwe têra wan heye." Dema ev deng bi guhê paşa dikeve, paşa fermanê dide mirovên xwe dibêje, herin wî zilamî binin. Zilam tînin, paşa jê dipirse, dibêje te çi kir ji kaxiz. Wê mesela kaxizê ji paşa re dibêje, piştî vê paşa dibêje tu bi bêhna devê min hesiyayî ezê te bikujim. Zilam dibêje paşa haya min ji tiştekî nîn e, koro li min bêbextî kiriye. Li ser vê gotinê paşa zilam efû dike û dibêje bi rastî jî, "Qencyê bi qencan re bike, xirabiya xiraban jixwe têra wan heye."

**Berhevkar:  
Zekî Beyazî**

## Şewra kulîlkan

Her sal, li biharê hemû kulîlk dicivin û şewra xwe dikin, ka bê xelata salê wê bidine kê. Xelata salê bi mercekê didin. Ew jî ev e: Kîjan kulîlkê karê tewrî qenc kiribe, xelat digihêje wê.

Di şewrê de berî giştî Gulê deng kir:

- Ez çûbûme daweta kurê-paşê. Min sîng û berê bûk û zavê xemilandibû. Ez serê jorîn, fêza texte (masê), ber mêvanên qedir û qîmet rûniştibûm. Min rewşeke taybetî dabû wê kêf û şahiyê.

Piştî Gulê Sorsork axivî:

- Lê ez çûbûme ser şîneke giran. Xortekî bermiraz miribû. Min tabûta wî xortî xemilandibû, di destên keç û xortan de min dabû pêşi-

ya êrdeka şûnê heta ser mezelan...


Binefs, Beybûn, Pivong, Sosin, Rihan û Kulîlkên din jî yekê li dû yekê rabûn û di şewrê de li ser karê xwe digotin.

Di dawiyê de Nêrgiz tê hundir. Jê dipirsin ka ew çima bi derengî ketiye? Ew bersiva xwe wiha dide:

- Ez ji dûr, ji çiyayên Kurdistanê tîm. Li sînga çiyê cênazê (cenazê) pêşmergekî ketibû û di bin tavê de xerab dibû. Min bi belgên (pelên) xwe ser wî cinyazê azadiyê kiribû sîper, ji bo xerab nebe...

Şewra kulîlkan biryar di-de xelata salê ya ji bo karê qenc, bidine Nêrgizê.

*Egîdê Xudo / Yêrivan*



# Li ser Asûriyan qirkirin qet neseकिन

Seyf Çiya

Heta dawiya vê qirkirinê, Asûrî besebê li benda bextê Îngilîz û Rûsan sekinîn. Ew, piştî vê eziyetê daxwaza heqên xwe dikirin. Lê ew xeyalekî vala bû. Tu kesî qala wan nedikir. Li ser nexşeyan, dewlet ava dibûn û xera dibûn, lê di nava wan de Asûrî tune bûn. Di peymanê Sewrê de, otonomiyek bi şert dabûn Kurdan. Hê di nava vê otonomiyê de jî, ji bo Asûriyan çend made fikirîbûn. Lê Serokê Komara Tirk M.Kemal, digot: "Ji bo me Peymana Sewrê qet çênebûye."


Di Lozanê de jî tu heq ji bo Asûriyan nehat dayîn. Dewleta Tirk vegera Asûriyên koçkîrî jî, qebûl nedikir.

Ev dem terora reş û resmî jî, li pey rewşenbîrên Asûrî bû. Di sala 1911'an de nivîskarê kovara "Yekîtiya Suryaniyan" Aşûr Yûsif bi destê Osmanîyan hate kuştin. Rewşenbîrê mezin Nazim Faik jî, di 1914'an de revîbû û çûbû Filistinê.

Piştî van salên qirkirinê, gelê Asûrî paceyên xwe li dinê girtibûn. Qirkirinek jî, di sala 1933'an de bi destê rejîma Bekîr Sidqî li Iraqê çêbû. Di meha Tebaxa 1933'yan de li Fêş Xêbûr, Duhok û Sêmil bêhtirî 2000 Asûrî bi bombebaran hatin kuştin û 60 gundên wan hatin şewitandin. Rejîma Sidqî, li dijî Asûriyan "cihad" vekiribû. Bi gotina zabitê Îngilîz R.S. Stafford: "Ev qirkirin, bû lekeyek reş, li ser navê Iraqê." Gelek Asûrî tevî zarokan û bi cilên ser xwe, derbasî Sûriyê bûn. Li ber çemê Xabûr di bin konan de jiyana xwe domandin, ku niha jî gelek Asûrî li wê derê dijîn. Piştî kişkirina tixûbên Sûriyê û Tirkiyeyê, Asûrî dîsa li Sûriyê dest bi xebatên rêxistinî kirin.

Li dora dêrê, xebata hinek rojname û medreseyan didomiya. Bi navê "Yekîtiya Suryanî", "Betnehtin" û "Mezopotamya" kovar hatin, derxistin.

Di navbera salên 1946-1949'an de, piştî hilweşandina Komara Mehabad a Kurdî,



dora qirkirinê hate Asûriyên Ormiyê. Li wê derê jî, rejîma Şahê Îranê bi sedan Asûrî kuşt û gundan xera kir. Bextê Asûriyan jî, wek ê Kurdan bû. Her der û her kes ji wan re neyar bû. Wek birayê ji dêyekê, axa van herdu gelan bûbû çar parçe û bi qedereke wekhev, li çar parçeyan belav bûbûn û li çar parçeyan jî di bin zordestiyê de bûn.

Li ser Asûriyan politikayên qirkirinê qet neseकिन. Koçkîrî jî neseकिन. Asûriyên ku diçûn derveyî welat, malbatên xwe jî, li pey xwe dibirin. Ji destpêka êrîşa Persiyân û vir ve, zêdetirî 2 milyon Asûrî ji welatê xwe dûr ketine û Asûrî bûne neteweyeke koçer. Piraniya wan jî asimile bûne û xwe ji xwîna Mezopotamyayê şûstine.

Ev pêlên neteweperest ku di van salên dawî de dest pê kir, di nava Asûriyan de jî belav bû. Rizgarbûna Başûr, bilindbûna şerê Bakur, jî bo vî gelê bêwelat jî, bû hêviyê nû. Niha bi taybetî li Ewropayê, komele û federasyonan xebata yekbûyî û vegera welat hatine damezirandin. Di van mehên dawî de, nezikî 10 Asûrî li Midyadê bi destê cerdevanan û bi destê tîmên taybetî

hatin kuştin. Di nava wan de endamên Qomîteya Vegerê jî hebûn û ew ji Ewropayê hatibûne welat.

## LI KURDISTANA BAŞÛR JIYANA ASÛRIYAN

Li Başûr niha nêzikî 200 hezar Asûrî dijîn. Li Başûr hemû belav bûne. Pirranî li bajarê Duhok û li Hewlêr bi cih bûne. Li Hewlêr di Taxa Aynkawa de nêzikî 20 hezar Asûrî jiyana xwe didomînin.

Rewşa Asûriyan, a aborî û ya civakî jî ya Kurdan hinek çêtir e. Di şer de û di serhildanê de jî Kurdan hindiktir zerrar dîtî. Di vê demê de politikayekê dualî pêk anîn.

Lê şervan û pêşmergeyên Asûrî, bi destpêka serhildana Kurdî re, li dijî rejîmê li gel Kurdan tevî şer bûn. Şoresgerên Asûrî çarenûsiya xwe bi Kurdan re girê dabûn. Şervana bi nav û deng, pêşmergeya jin Margîret bi salan di nava Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK-I) de ji bo mafên gelê xwe şer kir.

Endamê Qomîteya Navendî ya PDK'ê Fransûwa Herîrî ku, hevalê Melle Mistefa Berzanî bû, di nava Asûriyan de gelek navdar e. Sazûmankarê Partiya Komunîst a Iraqê (PK-I)

Salman Yûsif jî rewşenbîrek Asûrî bû. Di nava Yekîtiya Niştîmanperwerên Kurdistanê (YNK) de jî gelek şervanên Asûrî hene.

Li Başûr 3 rêxistinên Asûrî yên neteweyî hene. Di nava wan de ya xurt "Hereka Dîmokrata Asûrî" ye. Di sala 1957'an de hatiye damezirandin. Armanca wan, "Rêxistin û yekbûna gelê Asûrî û bireweriya dîrokî" ye.

Di hîlbijartina 1992'yan de, di Meclîsa Kurdistanê de 5 kursî ji bo Asûriyan hate veqetandin. Endamên Asûrî, di listeya PDK, YNK, PK-I û Hereka Dîmokrata Asûrî de ketin hîlbijartinê. PDK 1, Hereka Asûrî jî 4 endam derxist. Di hikûmetê de jî wezaretek wan heye.

Asûrî niha jî, wek dema Sedam ticaret û karbidestî dikin. Dêra Asûriyan Saînt Joseph, li Hewlêrê avahiyeke herî mezin e. Ji bo însaata wê Sedam 100 hezar Dînar alîkarî kiriyê. Rojên yekşemê 1500 Asûrî li vir dicivin û îbadeta xwe dikin.

Asûrî di nava malbatên xwe de bi zimanê Suryanî diaxivin, lê pirrê wan bi Kurdî jî zanin. Rûmeta çand û fêrdariyê, li gel wan bilind e. Pirr xortên wan li zanîngeha dixwînin.

Di hîlbijartina 1992'yan de, di Meclîsa Kurdistanê de 5 kursî ji bo Asûriyan hate veqetandin. Endamên Asûrî, di listeya PDK, YNK, PK-I û Hereka Dîmokrata Asûrî de ketin hîlbijartinê. PDK 1, Hereka Asûrî jî 4 endam derxist. Di hikûmetê de jî wezaretek wan heye.

## ARAMÎ

Ji bo eşkerekirina dîroka Asûriyan pêwîst e li ser Aramiyan jî bê sekinandin. Aramî jî beşek ji Asûriyan in. Di salên 1500'an de tîn dîtî. Di navbera axa Dicle û Fîradê de jiyane.

Her çiqas wek qebîleyeke serbixwe bîn xuyan jî, çand û şaristaniya wan bi ya Asûriyan ve hatiye girêdan û di pêvajoyê de heliyane.

"Oromge/ Aram" di zimanê Asûrî de bi wateya "bilind" e. Aramî wek ku li hinek çavkaniya tê gotin ne Erebin. Ji zimanê wan re "Aramî" tê gotin. Zimanê Asûriyan jî esas Aramî ye ku, îro jê re "Suryanî" tê gotin. Bi zimanê wêjeyî (edebiyat) jî zimanê Suryanî re Aramî tê gotin.

Dêra Suryanî jî hê zimanê Aramî bi kar tîne. Aramî, ji Cûlemêrgê heta Ruha û Tûr Abîdînê belav bûne. Suryanî jî vê herêmê, bi navê "Aramîn" bi nav dikin.

## Çavkanî:

1-Asur Ulusal Sorunu, Prof. Joseph Yakop  
2-Birlikte Yaşadığımız Halklar, Welatê Torî  
Wekî din ji hevpeyvinên bi berdeukên Tevgera Asûrî re jî hatine îstifadekirin.

welat

• Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar  
• Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat  
• Navnîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 513 34 33 Tel (fax) 511 50 07  
• Berpirsiyariya Ewropa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715  
• Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.